واختتم حوج:" بالنسبة لتسبب ارتداء ملابس البالة في نقل الامراض المزمنة والخطيرة, لم ترد لدينا حالات مرضية خطيرة بهذا الشأن أنما اقتصرت فقط على بعض حالات التحسس الجلدي, وهذه يمكن تجنبها وتلافيها من خلال عمليات التعقيم المستمرة من قبل العامل في هذا المجال ومن قبل الاشخاص الذين يستعملونها"

تأثير الاقبال على ألبسة البالة على قطاع الألبسة الجديدة:

أن انتعاش تجارة ألبسة البالة في المدن وبلدات المنطقة أثر بشكل ملحوظ على تجارة الالبسة الجديدة, نتج عنه حالة ركود في هذا قطاع.

يقول مروان داود (صاحب محلّ ألبسة):" أثرّت

تجارة ألبسة البالة على حركة البيع والشراء في سوق الالبسة الجديدة نتيجة ارتفاع اسعار الالبسة الجديدة, والذي يعود بدوره على الظروف التي تعيشها المنطقة من حصار وحروب وانعكاسها على ارتفاع الاسعار في كافة القطاعات وليس

الالبسة فقط.

وفي رأي مخالف حصر مسعود عمر(صاحب محل البسة) الإقبال على البالة فقط في موسم الشتاء بسبب غلاء اسعار الالبسة الشتوية (الجديدة).

وأضاف :" يضطر المواطن ذو الدخل المحدود والمتوسط إلى شراء الالبسة الشتوية من البالة فليس بمقدوره شراء جاكيت بمبلغ (٢٥٠٠٠) ل.س في حين بإمكانه شراءه من البالة بمبلغ (٣٠٠٠٠) ل.س.

وتبقى محال البالة التي تراها متوزعة بشكل كبير في جميع انحاء المدينة واسواقها

وجهة الغالبية الكبيرة من سكان المدينة, لاقتناء مستلزماتهم من الالبسة نتيجة رخص أثمانها, التي تنافس أسعار الجديد منها اليوم .

buyer PRESS
الخبر... بكل شفافية
www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683

شاعر كردي يطالب بتغيير اسم نادي الجهاد.. والسبب!؟

نادي الجهاد الرياضي هو أحد الأندية السورية التي تألقت وأثبتت وجودها, منذ تأسيسه في العام 1962 باسم نادي الشبيبة الرياضي، وبعد صدور المرسوم التشريعي رقم 38 لعام 1971 الناظم للحركة الرياضية في سورية تمت تسميته باسم نادي الجهاد الرياضي.

وتجاوز عدد المنتسبين إليه والذين يمارسون ألعابا مختلفة أكثر من 5000 منتسب ومنتسبة من بينهم 935 من فئة الإناث في فترة ما.

اسم نادي الجهاد الملازم لفريقه منذ ستينيات القرن المنصرم أضحى علامة فارقة لهذا الفريق الرياضي, وباتت المستديرة اللعبة الأهم في هذا النادي, والذي يبلغ تعداد مشجعيه بمئات الآلاف على طول المدن الكردية وفي الشتات.

الشاعر ابراهيم حسو ابن القامشلي والذي يعيش الآن في المهجر وجّه نداء عبر صفحته الشخصية وهو عبارة عن "رجاء خاصّ" يناشد القائمين على لعبة كرة القدم والمشرفين والإداريين في نادي الجهاد الرياضي بتغيير اسم النادي إلى أي اسم آخر.

لان هذا الاسم " لا يمتّ إلى الرياضة بشيء بل أنه اسم يذكرنا بالويلات والمجازر والقتل" على حدّ وصفه.

ويضيف حسّو:" باسم الجهاد تعرضت القامشلي وغيرها من المدن الشمالية إلى ساحة حرب استقطبت مجرمي الحرب من كل العالم".

فهل من آذان صاغية لهذا النداء, نداء برسم المعنيين في إدارة نادي الجهاد والقائمين على لعبة المستديرة في اقليم الجزيرة.

عودة "بعبع الشمال" للأضواء أصبحت شبه مضمونة في الموسم المقبل

تجاوز نادي الجهاد فريق المحافظة بفارق مواجهات الذهاب والإياب، رغم أن الخصم كان شريك الهبوط للدرجة الأولى، إلا أن وصول النادي لهذا الدور المتقدم أمر هام للغاية.

وقد تمكن نادي الجهاد من تحقيق إنجاز مميز بعد أن بلغ الدور ربع النهائي من مسابقة كأس الجمهورية بكرة القدم.

فالفريق منذ منتصف مرحلة الإياب وهو يعتمد على مجموعة من لاعبيه الناشئين والشباب، مع بعض الوجوه المعروفة، وهذا الخليط أعطى نتائج جيدة، ولو كانت الظروف المحيطة بالفريق مواتية لكان هروبه من الهبوط أمراً وارداً بقوة، هذا الأمر يعيدنا لبداية الموسم حين كانت الأصوات داخل النادي تنادي بضرورة الاعتماد على أبنائه بعيداً عن متاهات الاحتراف الوهمية التي تقتضي التعاقد مع لاعبين من خارج النادي بمبالغ كبيرة، ولكن وقتها كانت الكفة الراجحة لضم لاعبين بأسماء كبيرة دون تأثير فعلي على أرض الملعب، ما أعطى نتائج سلبية أوصلت الفريق للهبوط.

و إذا استمر فريق الجهاد بهذا المنوال، وإنْ استمر الاستقرار الفني والإداري، فإن موضوع عودته للأضواء في الموسم المقبل يبدو شبه مضمون ليعود لمكانه الطبيعي بين الكبار.

فتّاح الجهاد...يدخل الأضواء من اوسع الأبواب

دخلت أسماء جديدة شابة في عالم نادي الجهاد ضمن فئة الرجال، انتسبت إلى ذلك العالم بقوة ونشاط، وإثبات في الميدان، منهم ومن بينهم المدافع الشاب نوري فتّاح، الذي أظهر نفسه بقوة في المباريات الكبيرة التي خاضها، أثبت بأن اللاعب الذي يرتدي قميص الجهاد مهما يكن شاباً وصغير العمر، يكون كبيرا بولائه وعشقه وجدارته..لأنه ينتمي للبيت الأجمل نادي الجهاد.

نترقب الأجمل والأفضل لشابنا الجميل نوري فتّاح في قادم الأيام.

افتتاح ملعب حي السريان بقامشلو..

افتتح في حي السريان بمدينة قامشلو، الاثنين 28 أيار/ مايو، أول ملعب لكرة القدم في الأحياء الجنوبية من المدينة.

وقال الإداري بفريق حي السريان عبدالسلام سليمان :" إن الملعب الذي تم تدشينه في حي السريان، وأقيمت فيه مباراة بين فريق حي السريان وفريق ستار، حيث انتهت بفوز فريق ستار بهدف مقابل لا شيء، وهو الوحيد في الأحياء الجنوبية لمدينة قامشلو ابتداء من حي الكورنيش وحتى العنترية، وهو ما قد يوفر فرصة لعودة النشاط الكروي إلى هذه المنطقة بعد سنوات من التوقف نتيجة الأزمة".

هذا وقد تلقّى مجموعة من شباب الحي وعودا بتحويل الملعب إلى ملعب نموذجيّ، وبإشراف هيئة الشباب والرياضة في إقليم الجزيرة تم تسوية أرض الملعب ووضع قوائم للمرميين وتخطيطه.

ونوّه سليمان إلى أنّه هناك خطة من الاتحاد الرياضي لإعادة إحياء الملاعب الترابية في المنطقة، وقد تلقينا وعوداً من مكتب المنشآت في الاتحاد الرياضي بتعشيب الملعب ووضع سور حوله، وزراعة بعض الأشجار في محيط الملعب.

الجدير بالذكر أن مدينة قامشلو تشهد دورة رمضان الكرويّة، بمشاركة ستة عشر فريقاً، في ملعب الرافدين بحي الأربويّة .

زيدان يتفوق على مدربي العالم في دراسة جديدة

أظهرت دراسات إسبانية أن الفرنسي زين الدين زيدان، مدرب ريال مدريد، هو المدرب الأكثر شهرة في موسم (-2017 18) متفوقا على جميع مدربي الدوري الإسباني (الليجا)، والبطولات القارية في أوروبا، وحتى مدربي المنتخبات الوطنية.

وبحسب الدراسة التي أجرتها الشركة الاستشارية المتخصصة في الاتصالات االعلاقات العامة لنخبة الرياضيين "-Co municar es Ganar"، احتل زيزو صدارة ترتيب المدربين لهذا العام بعدما بات المدرب الأول في تاريخ دوري الأبطال الذي يحقق لقب البطولة ثلاث مرات متتالية.

وعلى مستوى الليجا، احتل المدرب الفرنسي صدارة الترتيب برصيد 79.3 نقطة، بينما جاء الأرجنتيني دييجو سيميوني، مدرب أتلتيكو مدريد، ثانيا بـ75.6 نقطة، وإرنستو فالفيردي، مدرب برشلونة، في المركز الثالث برصيد 65.5 نقطة.

وفيما يتعلق بالترتيب العالمي للمدربين الأكثر شهرة والذي شارك فيه 20 مدربا من الدوريات الأوروبية والمنتخبات الوطنية، عاد زيدان لتصدر لائحة الترتيب، بنفس عدد النقاط، ويأتي بعده الإسباني بيب جواردیولا، مدرب مانشستر سيتي الإنجليزي برصيد 78.9 نقطة، والإيطالي ماسيمليانو أليجري، مدرب يوفنتوس الإيطالي، بـ78.1 نقطة.

وضمن قائمة الـ20 الأفضل، احتل سيميوني المرتبة الرابعة، بينما جاء خلفه الإسباني أوناي إيمري، المدرب السابق لباريس سان جيرمان الفرنسي وآرسنال الإنجليزي حاليا، فيما حل جولين لوبيتيجي، مدرب منتخب إسبانيا، في المركز السابع برصيد 68.3 نقطة.

دورة رمضان الكرويّة

انطلقت دورة رمضان الكرويّة، في 17 أيار/ مايو، بإشراف الاتحاد الرياضي في إقليم الجزيرة. بمشاركة ست وثلاثين فريقاً من مقاطعة الجزيرة.

وتتميز هذه الدورة بالتنظيم و الحضور الجماهيري الغفير و الذي يعتبرونها رياضيو الجزيرة بالدورة الكرنفالية.

ففي السنتين الأوائل كانت تحت اسم " دورة الرمضان " و في السنة الثالثة بعد فقد أحد لاعبي الفرق التي كانت تشارك في هذه الدورة " أبو هاكوب " حياته، أصبحت الدورة باسم الفقيد حتى عام 2016 و بعدها أصبحت تحت اسم الفقيدين " أبو هاكوب و محمد شيخموس أبو لوران " الرياضي الذي فقدته قامشلو بيوم أسود للرياضة و للشعب بحكم وطنيته و حبه للرياضة .

أشرف على مدار ست سنوات لجنة ذات قوام صلب منظمة و تعددت فيها الأسامي منها أصحاب الفكرة وهم " المحامي وليد محمود، اللاعب الدولي جومرد موسى، الكابتن ديدار ظاظا و اللجنة الحالية " ديدار ظاظا - أحمد صبري - خالد عزيز - فراس رسول "

في هذه السنة استقبلت القرعة إقبال كبير لم تشهده من قبل في مشاركة فرق كثيرة وصلت إلى الستة و الثلاثون فريقاً تتراوح أعمارهم ما دون الثمانية و الثلاثون و قد وصلت الدورة للجولة الثالثة وهي في تنظيم مستمر و إسعاد الناس الحاضرة.

تعتبر هذه السنة غير السنين التي مضت من حيث إقبال الفرق.

أما من الناحية الجماهيرية فلا كلام يقال بحق جماهير هذه الدورة الذواقة التي تحتضن المئات يومياً دون بقاء محل شاغر حتى تعبئة المقهى المرفق بالملعب .

ريال مدريد بطلا للمرة 13 في دوري أبطال أوروبا

توج ريال مدريد بطلا للمرة 13 بلقب دوري أبطال أوروبا، السبت، عقب فوزه في النهائي على حساب ليفربول 1-3 في الملعب الأولمبي في العاصمة الأوكرانية كييف.

أحرز ثلاثية الريال كل من الفرنسي كريم بنزيمة في (د.51) والويلزي غاريث بايل في (د.64 و83)، فيما سجل السينغالي ساديو مانيه هدف ليفربول الوحيد في (د.55).

وعزز النادي الملكي رقمه القياسي محرزا لقبه الثالث عشر، والرابع في آخر خمس سنوات بعد 2014 و2016 و2017، فيما تجمد رصيد ليفريول عند 5 القاب آخرها في 2005.

اختتام بطولة عامودا التنشيطية بكرة القدم

اختتمت يوم الثلاثاء التاسع والعشرون من أيار/مايو بطولة عامودا التنشيطية بكرة القدم والتي نظمها ناديي أهلي عامودا ونادي الاخوة والسلام بمباراة بين نادي الآساييش ونادي روجآفا, وكانت النتيجة أربعة اهداف دون رد للآساييش وبذلك نال نادي آساييش روجآفا لقب البطولة بتسعة نقاط فيما نال المركز الثاني نادي الاخوة والسلام برصيد أربع نقاط وثالثا نادي أهلي عامودا بثلاث نقاط فيما احتل المركز الاخير نادي روجآفا بنقطة واحدة.

جوائز البطولة

- كأس المركز الأول نادي اسايش روجآفا.
- كأس المركز الثاني الاخوة والسلام.
- هداف الدورة باهوز محمد نادي اسايش روجآفا.
- أفضل حارس في الدورة جكر سعيد نادي آساييش روجآفا.
- أفضل لاعب ناشئ مناصفة بين محمود علي نادي أهلي عامودا ويوسف مروان نادي الاخوة والسلام.

وتم تكريم اللجنة المنظمة للدورة من قبل الاتحاد الرياضي

وهم ابراهيم علي - ناصر حسين - عبدالباسط سينو - موال حسي.

كما قام نادي أهلي عامودا بتكريم كل من لاعب الاخوة والسلام ولاعب نادي الوحدة السوري والمنتخب السوري للشباب والاولمبي النجم يوسف طويل.

ولاعب نادي أهلي عامودا النجم مظلوم موال بمناسبة انتهائه من واجب الدفاع الذاتي.

أيهم الخليل عاشق الشِباك. من الوجوه الجديدة الشابة لنادي الجهاد

استقبل نادي الجهاد اللاعب أيهم الخليل البالغ من العمر تسعة عشرة عاماً، يلعب في مركز الهجوم، وله شهية كبيرة على معانقة الشباك وإحراز الأهداف.

يملك ثقة كبيرة وقدم لا تخطأ في مواجهة الحراس، استعان به الجهاز الفني في عدد من المباريات باللعب كلاعب وسط بمهام متعددة، وقد أبدع في تنفيذ واجباته، خاصة من ناحية الاختراق وتمرير الكرات.

buyer PRESS الخبر ... بكل شفافية
www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683

داري: الرواية الفائزة بجائزة البوكر العربية عمل عادي أخطاؤها بالمئات.. ولجنة تحكيمها هنود

الشاعر جميل داري

حاز الكاتب الفلسطيني إبراهيم نصر الله على الجائزة العالمية للرواية العربية (البوكر) في دورتها الحادية عشرة، عن روايته التي حملت عنوان "حرب الكلب الثانية".

وحصل نصر الله على مبلغ نقدي قيمته 50 ألف دولار أميركي، بالإضافة إلى ترجمة روايته إلى اللغة الإنجليزية، مما سيسهم في تحقيق مبيعات أعلى للرواية والحصول على تقدير عالمي.

وتعليقا على فوز نصر الله كتب الشاعر السوري جميل داري على يومياته على صفحات التواصل الاجتماعي:" يفوز عمل أدبي بجائزة كبيرة ماديا ومعنويا، فيدفعك الفضول للقراءة كي تصل إلى الأسباب التي جعلت هذا العمل نسيج وحده وفريد زمانه".



وأضاف داري:" قرأت رواية الكاتب إبراهيم نصرالله التي فازت مؤخرا بجائزة البوكر التي تعد أكبر جائزة عربية، ومنذ السطور الأولى رأيتني أمام عمل عادي في أحداثه وشخوصه وسائر عناصره ".

ويتابع:" لكن ليس هذا المهم إنما الغريب العجيب هو أنه لا تخلو صفحة من صفحاته التي تجاوزت ال400 من أخطاء نحوية ولغوية لا يقع فيها طلاب المرحلة الإعدادية".

ويورد الشاعر جميل داري بعض الأمثلة من الأخطاء النحوية واللغوية:

إن في تلك التقنية قدر كبير ص151 - لو تخلينا فلن أتخلى هنا الجهل بجواب الشرط وصحة اقترانه بالحرف المناسب 221 - أن يستبدله برقاقة هنا الجهل بعدم معرفة المتروك والمأخوذ 309 - ذلك العتب الجارف والذي هنا وضع حرف العطوف الواو دون داع - المائة هنا الجهل بأن 100 تكتب وتلفظ مئة 55 - ركله بقدمه هنا الجهل بأن الركل لا يكون إلا بالقدم وليس باليد 57 - فاندفعتْ الرياح هنا الجهل بضرورة تحريك التاء لالتقاء الساكنين 61 - ليس في هذا الأمر توصيفاً هنا الجهل بعمل ليس 83 - كلاهما تحملان هنا الجهل بتأنيث كلاكما 260 - أن لا تخرج هنا الجهل بدغم أن واللام أي ألا112 - كتفه الأيسر129 هنا الجهل بأن الكتف مؤنث - هذا هو الشخص العشرين هنا الجهل بمحل ألفاظ العقود وعلامتها 77.

مشيراً إلى أن" هذا غيض من فيض فأخطاؤه بالمئات لا العشرات، فإن الأخطاء نفسها تكررت، إضافة إلى أخطاء لم تتكرر بل وقع فيها مرة واحدة، وهذه تحسب له لا عليه" ..

ولم تسلم الرواية من الاستخدام الخطأ لعلامات الترقيم مثلا: الرجل، الذي وكذلك أخطاء بالمئات.. حتى همزات القطع والوصل له في أخطائها اليد الطولى ..حسب الشاعر جميل داري.

ويستغرب داري:" طبعا ليس مطلوبا من الأديب أن يكون عالما لغويا، ولكن المطلوب أن يعرف بديهيات اللغة العربية، لا أن يكون بمستوى طالب مدرسي غير نبيه".

وأردف أنه :"من غير العيب أن يعتمد الكاتب على من يصوب له ويدقق، إذا كان جاهلا بقواعد العربية، ويبدو أنه ترفع عن ذلك، أما لجنة التحكيم فيبدو أنها من الهنود الذين يرطنون بالعربية".

ورأى :"أن معظم هذه الجوائز الكبرى غير نزيهة، تمنح لأسباب لا علاقة لها بالفن والإبداع في كل مجالاته الشعرية والنثرية" .

واختتم الشاعر جميل داري منشوره بعبارة:" وتحية للغة العربية المسكينة "..



عفرين

الشاعر الإيراني سيد علي صالحي

لا يسمعون
توئِدُ نازحي عفرين
لا يرون
دون غسلٍ أو كفن
العالمُ في غفلتهِ
رغم ذلك
وجنود الخواجة سليمان
رغم ذلك...لنقُل للخواجة سليمان
ـ مُسمِّموا جثث الأطفال ـ
لا قتل الحمام و لا إبادة الكناري
يعبرون صوب أحلامنا.
بعد معانقتنا لحلم الحرية
سيّان رأوا أم سمعوا
لن نيأس أبداً.
العالمُ يَستغفِلُ نفسه
ترجمها عن الفارسية: سامي داوود
ومدرعات الخواجة سليمان

قصيدة عفرين

عفرينُ فاحَ شذاكِ في الأطـــيابِ
كحبيـــبتي المزروعةِ بخضابي
في لوعتـــي في ضحكتي وشبابي
في حـــبِّ أبداً يلـفُ ـدارنا
في أيّ أوفٍ , قدْ غرفـــتُ وشدّني
في دمعِ امّي الـــطّاهرِ المنسابِ
عَبقٌ من الزّيتـــون والعنّـــابِ
في العاشـقِ المجنونِ بالحبِ اكّتوى
إني هواكِ ولي بحضـــنكِ قِصـةٌ
وهدى الى رَغَدٍ من المـــحرابِ
فاقت عن الأشـــعارِ والإعـرابِ
في الطـّاحونةِ تَطْحَنُ بجراحنا
فأراكِ دوماً في بهـــاءِ قصـائدي
كَرَحىً تدورُ بلحنِ صوتِ عذابي
حرفاً جميـــلاً رائع الألقـــابِ
في النّـهرِ ابداعُ الوجودِ مُؤَنـَقٌ
وأراكِ دومـــاً في لـيلِ حديقـتي
خفقاتهُ قيـــثارةُ الإطـرابِ
في حقلنا في نـــغمة المـزرابِ
في ريشـةِ البزقِ العتيـقِ المنتشي
وأراكِ بعـــضاً من جمـالِ حبيبتي
لتلاقي العشـــاقِ بالأحـبابِ
في خـــدِّها في رمشـــها الوثّابِ
قد كـانَ حبكِ في الشّغـافِ وأشدو
في بسمة النّهدِ الخجـولِ بصـدرها
أحلى الهوى في القلبِ والأعصابِ
في قدها في خصـــرها الخلابِ
فلكِ المـكانُ الأوحـَدُ في خافقي
في تيمِنا العـــذريّ في شـــهقاتنا
في دفتري في لهفةِ الأصـــحابِ
في قُبْلةِ الأهـــدابِ للأهـــدابِ
في سـور القـُرآنِ , ربّي أنـكِ
في حُسْنِ كلّ صـــبيّةٍ في جلّ ما
إظهارُ حُسْنِ حـــدائقِ الإقلابِ
في الـدّ رب من زهرٍ ومن أعشابِ
فيكِ العـــظامُ تعتـقوا كقصائدٍ
في الشّهدِ والليمـونِ في حقّلٍ لنـــا
منحـــوتةٍ من ماسةٍ وترابِ
في الثّـــين في الرّمان في اللبلابِ
فسـليمانٌ هدَّ عرشَ فرنســا
في الزّهرِ في الدّربِ الجّميلِ على الرّبى
ولحامد الشّـــعرِ الجميلِ إيابي
في البردِ في الإعصارِ في الأترابِ
فهـــذي عفرينُ الخـــلودِ تغنّي
في الزّنبق السّكرانِ فوقَ تلالـــنا
لبهاءِ صنعِ الخـــالقِ الوهّابِ
في جنّةِ العـــطّارِ والحطّابِ
تُغْني المدائِنَ مـــن غِنى نسماتها
في الأربـــعاءِ الحـــلو من بازارٍ
وتَجودُ بالنّفـــحاتِ فوقَ ربابِ
في صـــرخةِ الفلاح والقصابِ
في لـــون الوادي الكريـم بمائهِ
بتعانقِ الأعشـــابِ للأطيابِ
في دوحةِ الأطـــفالِ في حينا
في ثورتـــي في نشوةِ الطّلابِ
في المدرسة, في لهونا, في الهسهسة
في حلمنا المـــصلوب بالأعتابِ
في مقعـــدٍ محفـــورٍ بـحروفنا

آزاد علي

أنفاس الشوق

فلورا قازان

حينَ كانتْ الأنفاسُ
على خَلَجاتِ الشوقِ تتكئُ
كنتَ أنت
وحين كانت الأيامُ
خلفَ أهدابِ الغيبِ تختفي كنتُ أنت
ليبقى الدَّمْعُ
شلالاً بين أهدابِ الغروبِ
ورحلةً للشوقِ على أجنحةِ الشُّجونِ
سفرٌ طويلٌ
أيُّها المُزركشُ بشراهَةَ دَميْ
المسفوكُ نشوةً في خوابي عِطري
يَعْتَريني الدِّوارُ
ويلوكَني الانبهارُ
كيفَ يزحَفُ الشَّغَفُ إلى شَراييني
وكيفَ أردغُ أنوثةَ فراشةٍ
يندلقُ خَمْرُها من نضوجِ اللون
يشتعلُ خِلخالُها الغجريّ بالهيامْ
تَرقُصُ على ضفةِ الغرام ثوراتٌ ثوراتْ
مُدّ لي كفيْكَ من عرْشِ الجمالِ
كي أطالَ النجمَ في روحِ السماءْ
جنّةُ أرضي وقلبي شهقةٌ
في دوالي العشْقِ تجري في خَفاءٍ
إنّني أهواكَ بل أهوى أنا
بوحَ رُوحِ السَّحرِ في سرّ النقاءْ
فالتمسّ قلبي وكنْ لي عاشقاً
فأنا قد فقْتُ في عِشقي النساءْ
واقطفْ عناقيدي وعتِّقْ خمرتي
كي يَسيحُ الخمرُ من ثغرِ الثناءْ

الجِرْبياءْ

إبراهيم مينورا

أنا هنا ..
أكتسي لحميّ الرّطب
أنْكِرُ الصيفَ الهائجَ بأمواجه الهلامية
ألوّنه برماد عظام الآلهة
كزوابع الرّمل الفارغة من بريق أحلام
أنا هنا أيتها الجِرْبِياء
الحقول
أجْبَلتُ
سرابٌ ... سرابْ
و تقوّتُّ على الهزائم
أرَتّبُ الموتَ في معاجيل الزّمنْ
إعصفي الآن يا جِرْبِياءْ
وأفيء في خلوة القلق
فأنا أنقشُ الهزيمةَ وُشوماً فوق معصم
أبرِجُ الحلمَ
الزّمن
أعتصره دما بين تباريج "العلّيق"
بينما الهضابُ لتموزَ سنابلَ و منارات
فانتفض الشوكُ
أعتليها
و جَشِم الدّمُ
أنْهَرُ العيرَ إلى الوادي .. وأعتليها
أطاردُه...
أريد أن أرى جيوب الأرض
أتبعُ صداه
و مخابئ الصدى
حائرٌ بين أديان الجِهات
هياكل و جماجم الرّعاة
تنسلّ الجِرْبياءُ من بين الكمائن كالنّفير
أنا هنا ... هنا
فقفقتُ كعظامٍ في أضرحة الجلد
رغم شتاؤك المثيرُ للنّدم..
أنا هنا



ماتريوشكا ... تحزم الحقائب وتغادر دمي

علي مراد

موجع هذا الحنين المتربص ...
ويمسح دمعة عالقة بين خد السماء
هذا المساء المقيم في عزلة موحشة
ووجهي
غيابك يرمي بكل شذراته في صحن
ها أنا أتساقط على تخومك
الذاكرة
جمرات حب
يفتح نافذة العويل في
وآيات لهفة
وكالحلم يبعث حين يموت
ثم يجلس عنوة في آخر القلب
متى تعودين ... ؟
لأقطف من ضفائرك سنابل الضوء
لاتسكع على ضفة البخور ...
لأرقص مع فرح الخواتم
وكالفراشة احترق في ندوات الصقيع
اسمك ...
فقط اسمك وحده يستطيع فك حزن عظامي



استسلام

نارين حسين

لا أستسلم للغبار الذي في عيني ....
سأبكي وبكبرياء ....
حتى يسقط ..
لست محارباً ولا أحمل سيفا...
أجامل القدر وأخاطب النصيب ...
أملك اعناقهم، وهم في سلام ...
لا أستلم ...
وأحارب...
سأكون كالحياة ..
لا تعترف بأحيائك ..
ولا تعترف بقتلك...
تقبلك دون شفاه ..
وتعانقك دون احتضان ...
سأكون كالحبيب الذي لا يحب ..
وسأكون كإصرارك على النوم..
ولا أجعلك تنام..
ليقبل النعاس ويغفيني..
وهكذا...
أنا أنام ..
ومن دون استسلام



وطن الشمس

ميثاق كريم الركابي

بوطن الشمس
تفتح الحياة نوافذها
وضحكات طفولة
تفرّ من نكبات الحروب
ومواقد الشمال مشتعلة
بحطب الحب..
ولهفة النوروز نامت
بشفاه الصبايا.
كوردستان..
يا ترفاً بسوق الجمال
وشهقة برئة الزعفران
يا غرور ظفيرة
داعبت الخصر بحنان
تورق الاغاني على ينابيعك
ويسكر الصباح
على طيلسانك الأخضر
لا تلمني على الجفاء
فما بيني وبينك
فرح ضئيل
وخمائل أحرقها القدر
فتحول دخانها لقصائد ريحان
كوردستان...
احمليني بروحك الى الابد



خيبات ثملة

جان بابير

وتبتسمين..
في جيب معطفي المعلّق
أنا عائد من ليلة البارحة
على يديكِ التي جفّت في انتظاري
لأعلّق على مشجب خزانتك
أخبئ ما ليس لي
أشياء النساء الجميلات
أنتِ، أنا
أترك لكِ رف من الأحلام
ليس مكان عال لنهوى عنه
وخيباتي الصغيرة
سوى قلب صغير خبأته في اليد لنرتّقهُ
أنا مع قليل من أنفاسي
في إغماضةِ زوجتي

Gotar
R 2

Delîveyeke Teng di Ezmûna Bejî de

Melevan Resûl

Hevpeyvîn
R 3

Rêber Wehîd: “Hunera kurdî pir belengaz e, wekî şekirê tu bavêjî nav zad û bidî hev.”

Civak û Wêje
R 4

Venerîneke Dîrokî Li Rewşa Zimanê Kurdî 2

Deham Ebdulfetah

Bijartî
R 5

Helbestine Bijartî Ibrahîm Qasim

Dezgeha Bûyer a Ragihandinê
Rojname – Radyo – Malper
Birêvebirê Giştî:
Ehmed Bavê Alan
Birêvebirê Cîbicîkar:
Qadir Egîd
Têkiliyên Giştî:
Kewser Reşîd
Birêvebira Êzgehê:
Fansa Temo
Birêvebira Beşê Erebî:
Havana Mihemed
Birêvebirê Beşê Kurdî:
Ferîd Mîtanî

Buyer PRESS
Nûçe Bi Zelalî
Rojnameyek Siyasî -Civakî - Çandî - Serbixwe - Nîvmehane Ji Weşanên Dezgeha Bûyer a Raghandinê Ye Sala (5) Hejmar /79/ 1.6.2018 Buhayî PS 50
www.buyerpress.com buyerpress buyerpress1 buyerpresss@gmail.com Whats App 009639922386683

Hêzên HSDê ji Rojhilata Çemê Feratê Berê Xwe Didin Başûrê Hisiçayê

Hat ragihandin ku hêzên HSDê û Hevpeymana Navdewletî dê şerê li dorhêla bajarokê Hecînê ji bo demekê bidin rawestandin, da ku helmeteke leşkerî ya berfireh li gundewarê başûrê Hisiçayê bidin destpêkirin.

Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan di nûçeyeke xwe de piştrast kir ku hêzên HSDê û Hevpeymana Navdewletî dê helmeteke leşkerî li deverên Tel El-Çayir û Dişîşê ku li başûrê Hisiçayê ne û li jêr kontrola DAIŞê ne, bidin destpêkirin.

Rewangehê her wiha da zanîn ku di 29 û 30’ê gulanê de devera Tel El-Çayir a sînorî, ji aliyê hêzeke nenas ve bi giranî hat topbarankirin.

Hêja ye mirov balê bikişîne ser wê yekê ku li sernaserî Herêma Cizîrê, tenê deverên Tel El-Çayir û Dişîşê ku li ser sînorê Iraqê ne, li jêr kontrola DAIŞê mane.

Dengê Kevnar ê Radyoya “Dengê Kurdistanê”... Koça Dawîn Kir

“Vêre Dengê Kurdistan e”

Yek ji bêjerên pêşîn ê Radyoya Dengê Kurdistanê (1974) û damezrînerê Beşê Kurdî di Radyoya Dengê Amerîkayê de Xelefê Zêbarî, di 24’ê gulana 2018’ê de li Washingtonê koça dawîn kir.

Xelefê Zêbarî di 12’ê adara 1948’ê de li devera Zêbarê ji dêya xwe bûye. Di sala 1970’yî de bawernameya ragihandinê li Zanîngeha Mûsilê wergit û di 1974’ê de bû bêjerê Radyoya Dengê Kurdistanê.

Bi welatperwerî û dilsoziya xwe dihat nasîn. Xebatên wî ne tenê di warê ragihandinê de bûn, lê belê ew yek ji pêşmergeyên Şoreşa Elûnê bû. Her wiha di qada wêjeyê de jî du berhevokên helbestan (Zêra Reş û Warê Şêran) berhem dane. Yek ji helbestên wî yên herî navdar ku nemir Mihemed Şêxo bi awaz kiriye û sitraye, helbesta Nisrîn e.

Di sala 1975’an de penaberî Îranê bû, piştî du salan berê xwe da Amerîkayê û li wê derê di sala 1992’yan de Beşê Kurdî di Radyoya Dengê Amerîkayê de ava kir.

Xelefê Zêbarî li Amerîkayê hat veşartin, lê belê rê û resmên behî û serxweşiya wî li Herêma Kurdistanê hatin lidarxistin.



Hejmarek ji Partî û Rêxistinên Rojavayê Kurdistanê... Peyameke Hevbeş ji Neteweyên Yekbûyî re Şand

Hevbendiya Niştimaniya Kurd li Sûriyeyê (HEVBENDÎ), Partiya Yekîtiya Demqorat (PYD), Partiya Demoqrata Pêşverûya Kurd li Sûriyeyê û 10 kombûn û rêxistinên din ên Rojavayê Kurdistanê, ji Emîndarê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî û Komîserê Bilind ê Nûnergeha Mafên Mirovan re peyamek hinart.

Di peyama hevbeş a partiyan de, çend daxwaz hatine rêzkirin:

- Vekêşana Tirkiyê û komikên girêdayî wê ji Efrînê.
- Serbestberdana kesên revandî.
- Rawestandina kiryarên erebkirina Herêma Efrînê.

Di peyama xwe de partiyan daxwaz kiriye ku saziyên Neteweyên Yekbûyî di nêzîktirîn dem de rewşa Efrînê romal bikin, da ku binpêkirinên Tirkiyê bêne rawestandin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Hilbijartinên li Tirkiyê û HDP

Li Tirkiyê careke din hilbijartinên pêşwext ketin rojevê. Kurd jî dê di bin banê HDPê de tevlî hilbijartinan bibin. Erê, belkî wekî nav çend partiyên din jî li Bakur hene lê di nava civakê de giranî û ciyê wan partiyan tune ye. Her çendî wan partiyan navên islamî û kurdistanî li xwe kiribin jî, tu dilsoziyeke wan bi Kurdistanê re nîne, ew tenê ji bo berjewendiyên şexsî û hizbî hatine avakirin. Lewra mirov nikare wan wekî partî jî bihesibîne.

HDP li gel kêmasiyên xwe jî tevgera ku heta îro li Bakur wekî hêza azadîxwaz a kurd tête qebûlkirin. Ji ber ku HDP ji kevneşopiya tevgera azadiyê tê, gelê Bakur bi her awayî û di her şert û mercî de piştgîriya wê dike. Lê mijara ku dibêjin "HDP ne partiya kurdan e" hinekî mirov diêşîne. Yanî gava tu şivanekî deynî ber pêz, ew pez tev nabite şivan. An jî heke tu bizinekê bikî pêşenga revdek xezal, ew xezal tev nabine bizin. Lewra HDP tevgerek kurd e ku hemû deng û rengên cuda di nava xwe de dihewîne.

Ma heke kurd hebin, doza mafê xwe yê sosyal, siyasal û nasnameya xwe jî dikin çima gelo partiyeke wan a kurd jî tunebe? Ma gelo "nanê genim ji sêwiyan re heram e?" Yan jî heke navê "kurd" li ser HDPê be dîsa jî nikare wekhevî û demokrasiyê biparêze? Bi rastî ez bi vê sosretê tê nagihêjim. Bi ya min HDP dikare weke partiyeke kurd jî bi hêsanî ji miletên cuda yên li Tirkiyê ku ji derveyî pergalê mane, piştgiriyê bigire.

Ji bo serkeftina HDPê ya Hilbijartinên 24'ê Hezîranê parastina sindoqan girîng e, ji ber ku bi rastî desthilatdarên Tirkiyê dizên profesyonel in. Di warê potansiyela parastina sindoqan de HDPê potansiyeleke mezin heye. Carinan girtina tedbîran dikare dizan ji hizira diziyê poşman bike.

Di navbera Hilbijartinên 7'ê Hezîrana 2015'an û yên 24'ê Hezîrana 2018'an de wextekî pir dirêj nîne, lê ji bo kurdan bi qasî esrekî dirêj e. Lewra divê HDP bi anekdota Hilbijartinên 7'ê Hezîranê neçe ber deriyê gel. Hilbijartinên 7'ê Hezîranê gelê kurd bi gelemperî dengê xwe da HDPê ji bo ku bendava ji sedî deh derbas bike û bikeve meclisê, da ku pirsgirêka kurdan bi rêyeke aştiyane çareser bike. Lê îro hêviya gel ji meclisa Tirkiyê şikestiye. Ji bo ku ev milet bibêje "li gel hemû zilm û zora te ez heme û bi tevgera xwe re me", divê car din heman bendav were şikênandin.

Piştî encamên Hilbijartinên 7'ê Hezîranê derketin holê, dewletê dest bi talankirin û hilweşandina bajarên kurdan kir, dikarim bibêjim: di dîroka tevgera Bakur a legal de HDPê sinava herî xerab da û bi giştî mîsyona xwe ya ku gel li bendê bû bi cih neanî. Ez li ser egerên wê tiştekî nabêjim, a di çavê gel û hilbijêran de dixuye, wê dibêjim. Ev rastî nayên wê maneyê ku gel dê careke din dengê xwe nede

İncil Selçuk

HDPê, erê dê bide, lê HDPa ku van rastiyan li ber çavan bigire û bi vê berpirsyariyê tev bigere, dê bihêztir bibe û rêjeyekê ji hilbijartinên dema berê zêdetir bigire.

Serkeftina HDPê ya li Bakur dikare bandoreke erênî li her sê perçeyên Kurdistanê, taybetî Başûr û Rojavayê kurdistanê jî bike. Lewra her çi qas ev sed sal e ku Kurdistan ji hev hatiye qetandin jî, qedera me bi hev ve girêdayî ye. Di van salên dawiyê de me ev rastî baştir dît ku çawa Şengalê bi xwe re Cizîr, Şirnex, Sûr û Nisêbîn birin. Çûyîna Kerkukê jî bi xwe re dagirkirina Efrînê anî. Lê li gel van karesatan jî em xwediyên destaneyeke wekî Kobaniyê ne. Kobaniyê jî bi xwe re berxwedan, rûmet û serkeftin anîn. Lê divê neyê jibîrkirin ku li Kobaniyê yekîtiya kurdan berxwedana wê bi serkeftinê tacîdar kir. Lewra yekîtî dikare berxwedan û serhildanên li Kurdistanê bi serkeftinê tacîdar bike.

Delîveyeke Teng di Ezmûna Bejî de

Her qeyraneke ku rû bide, bi diyalog û helwesta vînxwaziya çareserîyê bi encam dibe, lê heta çi radeyê vîna me dê ji bo peydakirina alavên guhdarkirinê û lihevhesandinê, ji bo peydakirina prensîpên binemal di avakirina alternatîfên çareseriyê di ramaneke hemfikir de û çûna ber bi çareseriyê ve, bibe bersiv?

Hevdîtina rêzdar Aldar Xelîl bi rêzdar Hemîdê Derbendî re çirûskeke hêvî ji bêhêvîtiyê re vejand. Lê heta wekî niha, wê hevdîtinê tu bersiv negirtiye û tu agahî bi şêweyekî fermî derneçûye, ev bi xwe jî sinyaleke tirsnak di cadeya kurdî de peyda dike, nexasim ku her timî hevdîtinên me bi bêencamdayînê, sergihayî mane.

Lê em dikarin vê mijarê ji du hêlan ve bigirin dest:

1- Dagirkirina Kerkûk û Efrînê di kêşeya têkoşîna neteweyê kurd de bû ezmûneke girîng û pêwîstiya xwendineke siyasî ya saxlem ji rewşa pêşveçûnên nevdewletî û girêdana wê bi tevgera kurdistanî ve destnîşan dike.

2- Dirofên projeya Hevpeymana Navdewletî di nîgarkirina projeya Rojhilata Navîn de ku Kurdistan dê bibe navenda şerekî cîhanî û qada welatê me dê bibe meydana navendî di projeya nû de. Her wiha pêwîstiya hêzên cîhanî bi rola kurdan heye, ji ber ku di têkbirina çeteyên DAIŞê de kurd hem bûn hêza baweriyê hem Kurdistan dê bibe şahida şerekî giran li dij Îranê di demên pêş de.

Berjewendiyên hêzên Hevpeymanê bi hebûna hêzeke çalak a kurdî heye, nemaze dema dosyaya qeyrana rojhilata Çemê Feratê bi serperiştiya hêzên fransî xwe bide pêş û gotinên li ser zarê Koşka Sipî û axaftinên Trump ji bo vekişîna çekdarên amerîkî tên bihîstin. Heta radeyekê nûçeya radestkirina rêveberiyê ji bo hêza fransî ya xwedan ezmûneke dîrokî di dagirkirina tevahiya heremê de, belav dibe.

Ango em dikarin bibêjin ku ji her wextî bêhtir, pêwîstiya kurdan bi diyalog û lihevhatinê heye, nemaze lihevkirin û helwesta dewletên dagirkerên Kurdistanê li dij doza neteweyê kurd li her çar parçeyên Kurdistanê diyar bû, her wiha rastiya êrîşên hovane li dij hemû destkeftiyên miletê kurd bi dagirkirina Kerkûk û Efrînê eşkere bû. Tirsa di ser tirsê re ew e ku tevahiya heremên Kurdistanê veguherin navendên şer û pevçûnên dijwartir.

Bi qasî tê xwendin û dîtin, hîna ev mijar di mejiyê tevgera kurdî de nepijaye û hevdîtinên Xelîl û Derbendî xwe negihandine wê asta berpirsane, ji ber ku rêzdar Derbendî dosyaya Rojava û biryara Encûmena Kurdî ji mafê xwe dibîne û li şûna wê diaxive. Her çendî guhdarkirina li hev gaveke erênî ye û rêya diyalogê sanahî dike, lê dema em berê xwe bidin xalên hevdîtinê û mercên ku hatin rêzkirin, wê demê tu hêvî di rakirina nakokiyên navxweyî de namîne, nemaze dema ku rêzdar xwe wekî berdevkê ENKSê dibîne û çar xalan wekî prensîp destnîşan dike, ew jî: vekirina navendên partiyên Encûmenê, serbestberdana girtiyên siyasî, çavgirtina çavan ji hemû çalakiyên Encûmenê û rakirina bendan li hember serkirdeyên partiyên Encûmenê.

Baweriya min pê nîne ku Rêveberiya Xweser û TEV-DEM van mercan bipejirînin, nemaze dema wekî pêstûriyekî ji bal partiya PDKê ve werin sepandin.

Ji hêleke din ve ev yek tê wateya revandina vîna biryara partiyên Encûmenê û baweriya min pê nîne ku Encûmen pabendî tu biryarên

Melevan Resûl

lihevkirinê bibe. Lê heger çareseriya pirsa kurdî di Rojava de bi helwesta Hewlêrê ve girêdayî be, dîsa ev yek dibe sedemek ji arîşeyên hindurîn re û dibe fişareke nerewa li dij têkoşîna miletê kurd li Rojavayê Kurdistanê.

Bila em ji bîr nekin ku tu carî dewletên dagirkerên Kurdistanê destûrê nadin ku aliyên siyasî di Rojava de bibin yek, di serî de dewleta Tirk û her wiha hemû dagirkerên Kurdistanê.

Ji bo avakirina yekrêziya tevgera kurdî di Rojava de, pêwîstî bi biryareke kurdistanî û bi destekdayîna hêzên Hevpeymanê heye, Hevpeymana ku dikare li dij hemû gef û metirsiyên dagirkerinê garantiyê bide miletê kurd.

Mixabin, baweriya min pê nîne ku Başûrê Kurdistanê bibe navenda lihevhatina tevgera kurdî ya Rojavayê Kurdistanê; dewleta Tirk qet napejirîne ku Rêveberiya Xweser û TEV-DEM di nava diyalogê de bin. Her çi qas Başûrê Kurdistanê bixwaze nêzîkbûnekê di navbera her du aliyên kurdî pêk bîne jî, lê dewleta Tirk a dagirker dê Partiya Demoqrat tengav bike û insiyatîfa desthilatdariya Başûrê Kurdistanê tev werde, di encamê de rêzdar Derdendî dê gavan bi paş de vekişîne û dubare em ê têkevin nav sergêjî û teşqeleyên bêdawî.

Hilbijartin yan Bidestxistina Rewabûna Têkçûyî?

Dagirkerên tirk li Kurdistanê di her pêvajoyê de serokeşîr, şêx û axayên hevkar bi kar anîne. Hetanî salên heftêyî jî bi giranî zarokên van derdorên navborî wekî parlamenter diçûn meclisa tirkan û dema mirov piçekî li dîroka hilbijartinên T.C (Komara Tirk) binêre vê bi hêsanî dibîne, mînak: li Elezîzê paşnavê Septîoglu, li Ruhayê paşnavê Bucak û li Meletî paşnavê Dogan bi serê xwe vê zelal dikin. Serokên partiyên dewleta tirk ji van kesan hez nekira jî, ji bo dengê wan ji rikberê wan re neçe, ew berendam nîşan didan.

Suleyman Demîrel di hilbijartinekê de kesekî rikberê xwe wek berendam nîşan dide. Li ser vê kiryara wî hevkar û dostekî wî jê re dibêje: "Ew li pişt te gotinên herî xirab dibêje, çêran dike. Tu çima wî wekî berendam nîşan didî?" Suleyman Demîral wisa bersiv dide: "Li cihê ku ew kûçik xwe bide kêleka rikberê min, biewte ser min, bila li derê min be, biewte ser dijberê min!"

Mînakeke din jî heye ku ez jî dîtnêr û govanê wê bûm; di havîna sala 1966'ê de piştî erdheja Gimgimê, gundiyên me mizgevta rûxiyayî lêdikir, şêxê Melekan ê girêdayî Solaxan hat gundê me, hemû mislimanên wê Deşta Baskan li gundê me civiyan. Ez hêj pazdehsalî bûm. Her çendî em Yarsaniyên bakur (Qizibaş /Kumsorî) bûn jî, vê bala min kişand, ez jî çûm. Hinan wer bawer dikir ku ji bo pîrozkirin û bi dîroz vekirina mizgevta nû hatiye! Na ew ne ji bo mizgevtê, ji bo ku gel dengê xwe bidin Suleyman Demîrel hatibû. Demîrel ji wî re pere dişand û xwerû dengên mislimanên Solaxan, Kanîreşê, Gimgimê û beşekî Deşta Mûşê tev de ji AP (Edalet Partîsî) re diçû.

Ev hilbijartina li Tirkiyê ya 24'ê pûşperê, ji hilbijartinê zêdetir, di vê pêvajoya têkçûnê de rêya bidestxistina rewabûnê ye. Di bingeha xwe de li parlamentoyê hejmara parlamenterên Serkariya AKP-MHP têra derxistina hemû biryarên di hêza zagonê de (KHK) dike. Hemû bend di destên wan de ne. Jixwe zagon jî nehiştine, çi û çawa dixwazin wisa diçerixînin. Ji hilbijartina asayî re jî hê sal û nîv heye. Bi awayekî xwezayî ev pirs derdikeve pêş me: Ji bo çi ev hilbijartina di ser de girtî?

Serkariya dagirkerên tirk a di rengê AKP-MHP de demeke dirêj e ku di nava bala cîhanê de rewabûna xwe bi her awayî wenda kiriye. Sermayedarên Tirkiyê jî êdî bi ti awayî bi vê serkariyê bawer nakin, lema razandin û samanên xwe derdixin dervayî Tirkiyê. Dewlet û sermayeyên derve jî naxwazin ti karî li Tirkiyê bikin. Dolar û Euro serê xwe girtiye û diçe, pêşî lê nayê girtin. Ti hêzên cîhanî yên fînansê wekî IMF jî bi wan bawer nake ku qiredî bide wan. Ango aboriya Tirkiyê li ber têkçûnê ye. Vê serkariyê binê dewleta dagirker wisa vala kiriye ku dewlet bi krîzeke aborî û darayî re rû bi rû ye, ha ket ha bikeve. Eger di vê dema kurt de manevreyekê nekirina, ev serkarî bi vê krîzê re têk diçû. Ev ji hilbijartineke pêşdem bêtir, manevreyeke rizgarkirina serkariya AKP-MHP û ya dewleta dagirker e.

Em baş dizanin ku li Tirkiyê tenê partiyeke dagirkeriyê heye, ew jî partiya nijadperest e. CHP û AKP ne partiyên cuda, baskên vê partiya nijadperest in. Partiyên din jî çêlîkên van her du baskên vê partiyê ne. Dewleta dagirker li gor konsepta parastina xwe her carê yekî derdixe pêş û wekî hêvî difiroşe gel. Ji bo vê rastiyê mînaka herî balkêş Partiya Gelan HDP bi her awayî hedef girtine. Ew manevreyên CHPê bi serê xwe vê rastiyê li ber çavan radixînin:

1- CHPê bi aşîkarî piştgîrî da AKPê û ji bo girtina parlamenterên HDPê parêzbenda parlamenteran da rakirin, lê heman CHP ji bo ku Akşenera wezîra kuştinên qaşo kujerê wan nediyar têke parlamentoyê 15 parlamenterên xwe da partiya Akşenera faşist.

2 – Dewletê baskên partiya xwe di du koman de civandin û bi zelalî destnîşan kir ku ev benda hilbijartinê tenê ji bo HDPê ye, ango ji bo girtina li pêş kurdan hatiye danîn. Ji ber ku hêj pêdiviya dewletê bi serkariya AKP-MHP heye, dê bi her awayî hewl bide ku HDPê di bin benda hilbijartinê de bihêle, da ku hemû parlamenterên HDPê jî ji AKPê re bimînin.

AKP-MHP ji bo sextekariyên hilbijartinê bi awayekî aşîkar pêk bînin, zagoneke nû ya hilbijartinê jî amade kirin û dan derxistin. Dê bi kotekeke dijmirovî re fend û fûtên hilbijartinê bi her awayî pêk bînin. Li gel wê hemû saziyên dewletê ji bo pêşî li gel û dengê HDPê bigirin, ketine nava tevgerê, dibe ku çekê jî bi kar bînin. Jixwe ji niha ve, qaşo walî û fermandarên wan ên leşkerî gund bi gund digerin û gefan li gel dixwin.

Vê serkariya AKPê ew azînên Fetullahiyan wergirtine. Li gel bikaranîna diyanet (keyxwida) û meleyên bi wan ve girêdayî, edîbe, hemû şêxên terîqetan xistine nava gel, ev zebanî gelek caran jî bi kesên çekdar re digerin, bi geflêxwarin û serîşûştinan, dixwazin têkbirina gelê kurd bi kêmasî di warê hişmendî de bigihîjînin encamekê. Her wisa tevahiya çapemeniyê jî girtine bin kontrola xwe, bê navber lehiya derewan zerkê mêjiyan dikin. Ew di vê hilbijartinê de hinek jî bi vê karê xwe yên bêxt bawer in. Vê jî wêrekiya hilbijrtinê daye wan.

Parlamento qada têkoşînê ya rewabûnê ye. Gelên ku vê rewabûnê bi dest nexin, di qada navnetewî de wer zû nayên nasîn. Dema partiyeke wek HDP benda ji sedî 10 derbas bike, ev dike 6-7 mîlyon hilbijêr. Rengê HDPê çi dibe bila bibe, ev jî di qada navnetewî de rewabûnekê ji bo tevgera kurdî diafirîne. Dewleta dagirker ji bo ku bikane kurdan li dervî parlamentoyê bihêle, olana rewabûna kurdan a navnetewî têk bibe, wan wek komê biçûk ên terorê ku ji gel qut in nîşan bide û krîminalîze bike, bi navê "Cumhur ittîfaki û Halk ittîfaki" du eniyên hilbijartinê demezirandin û bi zanistî HDP li derve hişt. Li gel wê dewletê gelek trolerên ku bi navê kurdan mejiyên kurdan tevlihev dikin jî, xistine nava tevgerê, mîna gotina: "HDP têkeve parlamentoya wan çi dibe, nekevê çi dibe!" Gotineke troleran e.

Dema di ronahiya van rastiyan de em li rewşa ku HDP tê de ye dinêrin, tabloyeke gelek taybet derdikeve pêş me. Dewleta tirk 10 000 endamên HDPê yên bijarte ku bingehê polîtîka HDPê bûn û kar dikirin bi tevê şaredar, şêwirmend û perwerdekaran ve girtine. Zagoneke nû ya sextekariya hilbijartinê derxistine. Hêzên -qaşo- ewlekariyê jî bê navber êrîş dikin. Bi gotineke kurt HDP anîne ber felcbûnê. Di rewşeke wiha de tenê pêşbirkek li pêş wan heye; li hember hemû dijwarî û bêderfetiyan, hemû êrîş, dizî û bêbextiyan bi ser ketine.

Bê van rastiyan ev hilbijartineke di ser de girtî ye. Her tişt divê di demeke kurt de bi lez û bez werin çareserkirin. Yanê wekî berê endaman bi rêyeke demokratîk û piştî lêkolînên bingehîn û rexneyên dilxwazan hilbijartin gelek dijwar e. Bê guman di



Fêrgîn Melîk Aykoç

rewşên wiha de ku giyanê partiyê di zindanan de ye, gelek caran jî şaşiyên mezin tên kirin. Ev lîste ne li gor dilê me be, bi kêmasiyên pir mezin jî dagirtî be, divê em di vê rewşa awerte de rexneyên tûj ku dikanin bikevin xizmeta dagirkeran bidin aliyekî, yan jî ji dema pêş re bihêlin û bi hemû kanîn heredarî û hêza xwe ve piştgîriyê bidin HDPê. Di rewşên demokratîk de jî di hilbijartina endaman de hin kes dilê xwe digirin, ji lew re her kes dixwaze ku berendamê wan li pêş be, yan jî her kes xwe mafdar dibîne.

Ez hêvî dikim ku mirovên me bi hişmendiyeke kamil, têgihîştî û bi xwendineke baş ji rewşê re nêzîkî vê mijarê bibin. Ev hilbijartin, ne şoreşeke demokratîk ne jî şoreş e ku em hin pirsgirêkên şoreşê yên demokratîk deynin pêş HDPê. Tiştê herî girîng divê ev çembera bêbext were parçekirin. Piştî wê em serê hev biêşînin.

Nivîsên ku tên weşandin, nerînên xudanên xwe ne.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Hunermend Rêber Wehîd: “Hunera kurdî pir belengaz e, wekî şekirê tu bavêjî nav zad û bidî hev.”

Bi nasnameya xwe ya kurdî, li asîmanê hunera erebî bilind bû û derbasî dilê hemî neteweyên deverê bû. Hunermend Rêber Wehîd di sala 1970’yî de li bajarê Qamişloyê ji dêya xwe bûye. Hêj di temenekî biçûk de bû, dest bi sitranbêjiyê kir û di hejdehsaliya xwe de jî derbasî qada awazdaneriyê bû. Ji berî ku wekî hunermend were nasîn, di salên 90’an de li milê Tirbespiyê mamostetî dikir. Di sala 2002’yê de çawa ku alboma wî ya bi navê Sîmfoniya Evînê derket, nav û dengê wî li tevahiya cîhanê belav bû. Ji bilî xebatên hunerî, ew Balyozê Niyetên Pak ê Neteweyên Yekbûyî ye. Di şerê Efrînê de yekem karwanê alîkariyên mirovî ji hêla wî ve derbasî Efrînê bû. Her çi qas mirovekî kurd e û bi kurdbûna xwe şanaz e jî, lê belê bi mebest an jî bi zanebûn berê xwe da hunera erebî, da ku bigihe armanca xwe. Di vê hevpeyvîna jêrîn çend xalên girêdayî jiyan û hunera Rêber Wehîd diyar dibin, her wiha der barê hunera kurdî di roja îroyîn de jî hunermend Rêber Wehîd nirxandinên xwe tîne zimên.

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtanî

- Hunermend Rêber Wehîd hem li ser asta neteweyê kurd, hem jî li tevahiya Rojhilata Navîn hunermendekî navdar û naskirî ye. Lê helbet hilkişîna bi çiyayekî ve û gihiştina lutkeyê, ji gaveke pêşîn dest pê dibe. Îcar dixwazim wan kêliyên pêşîn ên jiyana te ya hunerî binasim.

Gava min a pêşîn ji vê derê bû, ji bajarê min Qamişloyê bû. Dema ez biçûk bûm min di dibistanan de disitra. Dikarim bibêjim ez pêncsalî bûm dema min cara pêşîn sitra.

Min bi sê zimanan disitra: tirkî, erebî û kurdî. Paşê ez fêrî suryanî û ermenî jî bûm, her wiha min gelekî bi hindî jî disitra. Kêfa min ji dawetan re dihat. Carinan di dawetan de min li hunermend guhdar dikir û ji xwe re digot: “Ma ez ê kengî bibim wekî wî?” Di hejdehsaliya xwe de min dest bi awazdaneriyê kir û wê demê min sitranek da Necwa Kerem. Paşê min li ser kêmendaman û xerîbiyê jî sitra. Lê wekî navdarbûn, di sala 2002’yê de dema min alboma “Sîmfoniyet El-Hub” berhem da, nav û dengê min belav bû û ez li tevahiya deverê hatim nasîn.

Ez nehatime guhertin, ez Rêber im, lawê Qamişloyê me.

- Ji sitranên kurdî zêdetir, Rêber Wehîd bi sitranên erebî tê nasîn, ji ber çi?

Min li gorbuhişt Mihemed Şêxo û gelek hunermendên kurd ên hêja nihêrî ku li ser asta cîhanî ne naskirî ne, vê yekê bala min kişand! Min ji xwe re got: “Çima ez bi erebî nasitrînim ji bo ku xelk min nas bike û dûv re bi kurdî bisitrînim!” Min wisa kir û bi rastî jî miletê ereb bi dest xwe re ez nas kirim, jixwe ji berê ve kurd min nas dikin. Tişteke din jî heye: Ragihandina kurdî -bibûre- ji aliyê hunerî ve qels û lawaz e. Li beramber wê dixwazim tenê mînakekê bidim: Eger Kenala MBC bernameyeke biçûk jî biweşîne, tevahiya dunyayê jê agahdar dibe. Îcar eger tu bernameyeke mezin jî di kenaleke kurdî biweşînî, tu kes dê pê nehese, ne kurd ne jî ereb.

Ji berê ve û hetanî roja îroj jî, tevahiya kurdan li bernameyên MBC temaşe dikin, çima? Ji ber ku ragihandineke xurt û xwedî nerîn e.

Ez nehatime guhertin, ez Rêber im, lawê Qamişloyê me. Hemî berhem û xebatên min bi navê min in; ango min navê xwe nekir Fadî ne jî Îsam, ev qas xelk dizane ku ez kurd im. Min sitran û awaz dan Necwa Kerem, Diyana Hedad, Asî Helanî û piştre min “Sîmfoniyet El-Hub” derxist, her wiha min sitrana Eyşo jî sitra, lê belê min zimanê xwe ji bîr nekir.

- Ji axaftinên te dixuye ku te ragihandin û hunera erebî wekî navgîneke navdarbûnê ji xwe re didît, an?

Na, ne tenê ji bo navdarbûnê, lê ji bo ku zanibin min bi erebî sitra û ez bi ser ketim.

Îro Selîm Berekat mirovekî kurd e û bi erebî dinivîse, lê hevrikiyê bi nivîskarên ereb re dike. Yanî ji bo ku dunya hemî zanibe: erê em kurd in, lê em bi zimanê wan jî jîr in.

Kurd bi aqilê xwe nafikirin, lê bi dilê xwe difikirin, ji ber vê yekê pir şaştiyên kurdan hene.

Di hunera kurdî de tişta herî balkêş ji bo te çi ye?

Hunera kurdî bi hemî aliyên xwe ve balkêş e. Miletê kurd miletekî feqîr û belengaz, miletekî birîndar e. Ji xem û derdan, ji sitranan pê ve, tu kesekî kurdan tune ye. Kurd bi aqilê xwe nafikirin, lê bi dilê xwe difikirin, ji ber vê yekê pir şaştiyên kurdan hene. Wisa ne baş e, her tişt bi aqil dimeşe.

Xwedê di pirtûka pîroz de gotiye: “اعقل و توكل”. Miletên dunyayê hilfiriyan esmanan; hunera wan, pirtûkên wan, dîwan û berhemên wan hene. Hunera kurdî pir belengaz e, wekî şekirê tu bavêjî nav zad û bidî hev. Sedemên vê yekê jî hemî partiyên kurdan in, partiyên kurdan hemî tişt tevlihev kirine û her tişt bi xwe ve girê dane.

- Eger em bi çavekî hunerî yî pisporane li babetê binihêrin û hunera kurdî û erebî bidin ber hev, çi cudahî di navbera wan de heye?

Hunera erebî ji aliyê not û meqaman ve pir li pêş e. Hunermendên kurd ên ku bi awayekî bilind û akademîk hunera xwe pêşkêş dikin pir kêm in, wekî: Feqiyê Teyran û Dilşad. Ji aliyekî din ve jî hunera erebî hatiye belgekirin û parastin, dibistanên ereban ên hunerî hene. Em kurd, tenê hunera me li bal bav û kalan e, eger ew bav û kal çûn hunera me jî diçe, îcar de ka were û lê bigere! Êdî nema ew parçeyên hunerî tên bidestxistin. Rast e em ne dewlet in, lê divê hunera me were parastin.

Hunera kurdî wekî huner pir dewlemend e, lê wekî parastin û xwedîlêderketin pir jar û feqîr e.

- Tu herî zêde li kîjan hunermendên kurd guhdar dikî, ango herî zêde hunera kê bala te dikişîne?

Mihemed Şêxo, Tehsîn Taha û Se’îd Yûsif. Ez ji yên kevin hez dikim.

- Ji ber çi ev nav, çi di hunera wan de heye?

Rastî tê de heye, tu miletê kurd di hunera wan de dibînî. Evînî, welatperwerî, koçberî û gelek hêmanên din di hunera wan de tên dîtin. Hunermendên aniha dikarin serê sibehê ji xew rabin, biçin tomargehê û dengê xwe tomar bikin, lê yên wekî Mihemed Şêxo, Tehsîn Taha, Îsa Berwarî û Se’îd Yûsiv gelek zor û astengî dîtine. Bê guman gelek hunermendên kurd ên dema niha jî dengê wan xweş e û hunera wan paqij e.

- Di roja îroyîn de bi dehan ji amûrên muzîkê yên pêşketî peyda bûne û derfetên berhemdana sitraneke di asteke bilind de pir bûne. Di demeke wisa de, amûrên muzîkê yên nûjen çi qasî rola xwe dilîzin, an jî dengê xweş bi tena xwe çi qasî dikare belav bibe?

Hunermendên îro herî zêde guh didin muzîk û stîlê. Gelek hunermendên ereban hene li ser asta cîhanî navdar in lê dengê wan tune ye, wekî Heyfa Wehbî tenê reng û stîl e.. Wekî din, gelek hunermend li bal me hene dengê wan bi tembûrê re xweş e û bi amûrên muzîkê re na, dengê wan diguhere. Ji sala 90’î hetanî 2000’î, nirxê hunerê hebû, lê îro em di 2018’an de ne, nirxê hunerê daketiye. Wekî mînak jî bidim: dema min albomên xwe derdixistin, bi pereyekî zêde dihatin firotin, lê îro hema tu internêtê vekî, sitrana tu bixwazî dikarî daxînî. Îro hunera sivik û bênirx li bazarê belav e, kesê guhdar li gotinên sivik û beredayî digere. Her ku diçe, nirxê hunerê dadikeve.

- Eger tu sitranekê binirxînî, di nirxandina xwe de herî zêde giraniyê didî deng, an gotin an jî awazan?

Di destpêkê de gotin, piştre awaz û herî dawî deng. Ji ber ku sitran bi gotinan ava dibe, bi awazan xweş dibe û yê ku dibêje sitranbêj e, ango deng e.

Aniha min sitraneke ku bi çar zimanan (erebî, ingilîzî, rûsî û îranî) tê gotin, amade kiriye

- Di demên bê de çi projeyên te yên hunerî hene?

Aniha min sitraneke ku bi çar zimanan (erebî, ingilîzî, rûsî û îranî) tê gotin, amade kiriye, navê sitranê “Sûriya El-Hub” e. Her wiha cara pêşîn e ku sitraneke devokî bi zimanê kolanê amade dikim, ew jî aniha amade dibe, navê wê “Xelî Yiwelî” ye. Ez aniha ji Elîsa, Rebî El-Esmer, Mu’în Şerîf û Newal Zuxbî re sitranan amade dikim

- Eger hejmareke destnîşnakirî li bal te tune be jî, lê dixwazim bizanim hetanî aniha te awaz û sitran dane kê û kê?

Min gelek sitran û awaz dane, hin hunermend hene bi gotin û awazên min pir navdar bûne. Min sitran û awaz dane Asî El-Hilanî, Necwa Kerem, Diyana Hedad, Mihemed El-Mazim, Ceylan, Letîfa Tûnisiyê, Refîq Sibê’î, Mehmûd Ceber, Hala Hisnî, Eymen Rida û gelekên din.

- Ji hunermendên ereb, herî zêde tu li kê guhdar dikî?

Kêfa min gelekî ji Nazim El-Xezalî, Azar Hebîb û Esmehan re tê. Yên aniha pir kêm li wan guhdar dikim.

- Di roja îroj de tu Balyozê Niyetên Pak ê Neteweyên Yekbûyî yî. Kengê û çawa tu bûyî balyozê wan?

Di sala 2011’an de şahiyeke min li Libananê hebû. Şandeyeke Xaça Sor a UNICEFê di wê şahiya min de amade bûbû. Di wê şahiyê de min gotinek got, min got: “Ev şahî ne ji bo min e, 10 zarok hene dilên wan qul in, ez ê ji kîsî xwe wan emelî bikim.” Îcar evê yekê pir bala şandeya UNICEFê kişand. Endamên şandeyê bang li min kir da ku bizanin ka ev gotin çi qasî rast e, min ji wan re got di vê şahiyê de min 6000 dolar sitandiye, tenê 500 dolarî ji xwe re dibim û 5500 dolarî didim ewan zarokên nexweş. Paşê rapor û buhanameyên nexweşxaneyê jî dîtin û gihan baweriyekê ku ez rast dibêjim. Piştî ku nîştergeriya wan zarokan qediya bi du rojan, şandeya UNICEFê telefona min kir û min li Beyrûtê ew dîtin. Di wê hevdîtinê de girêbesta min çêkirin û ji min re gotin tu bûyî Balyozê UNICEFê yê Kêmendaman.

Di 8’ê adarê de min 20 kamyon alîkariyên mirovî derbasî Efrînê kirin.

- Di şerê Efrînê de dema ku efrînî koçber bûn, hewildanên te yên xurt ji bo derbaskirina alîkariyên mirovî hebûn. Dixwazim xebata te ya wê qonaxê bizanim û gelo ta çi radeyê te karîbû alîkariyan derbas bikî?

Di 20’ê meha yekê de şer dest pê bû, ez 12’ê meha 2’yan giham Efrînê. Ji 20’ê meha yekê hetanî 1’ê adarê, alîkarî bi yek carê nehatin. Di 8’ê adarê de min 20 kamyon alîkariyên mirovî derbasî Efrînê kirin. Dikarim bibêjim ji 20’ê meha 1’ê hetanî 8’ê adarê, ez di nava tevger û hewildaneke xurt de bûm, hetanî min karîbû wan 20 kamyonan derbasî Efrînê bikim. Helbet Hikûmeta Sûriyeyê nedihişt alîkarî derbas bibin, hetanî min erêkirina hikûmetê anî, qirika min qetiya. Miletê Efrînê ji hemî aliyan ve zordarî lê hat kirin; ji aliyê ragihandinê ve, ji aliyê piştgîriya mirovî ve, ji aliyê navdewletî ve û ji hemî aliyan ve mafê miletê Efrînê hat xwarin.

Eger ne ji firokeyan baya, tu carî tirkan nikarîbû gavekê nêzîkî gundên Efrînê bibin

- Der barê rewşa deverên kurdî yên Rojavayê Kurdistanê de, li gorî pêşbîniyên te rewş ber bi kû û çi ve diçe?

Ez mirovekî rastgo me û bila tu kes xwe ji min nexeyidîne. Devera ku serweriya dewletê tê de tune be dê devereke sist be, bila em ji tecrubeya Efrînê hîn bibin. Du hevpeymanên herî xurt ên rêjîma Sûrî hene: Rûsya û Îran. Lê em -helbet hevalan gelekî xwîn rijand- hevpeymana me Amerîka ye û Amerîka ne cihê baweriyê ye! Tirkiye me naxwaze, Sûriye me naxwaze û Îran me naxwaze. Eger tu bixwazî dewletekê ava bikî, divê herî pêşîn tu ji aliyê asîmanî ve xurt bî. Binere li Herêma Kurdistanê du-sê mehan biryara qedexeya dijfirînê li ser balafirxaneyên wê hat bicihanîn, çi bi serê wê hat! Ma Efrîn çawa ket? Ji aliyê asîmanî ve Efrîn ket, eger ne ji firokeyan baya, tu carî tirkan nikarîbû gavekê nêzîkî gundên Efrînê bibin. Şervanên YPG û YPJê gelekî xurt û zana ne, lê ka li hember firokeyên Tirkiyê dê çi bikin? Çekên me yên giran tune ne û ji aliyê teknîkî ve jî hêza me tune ye. Ez dibêjim devera me aram namîne. Ez ê gotinekê bibêjim û ez berpirsyarê gotina xwe me: eger hikûmeta Sûrî xurt bibe, di cî de dê berê xwe bide deverên kurdan. Hişmendiya be’siyan (Partiya Be’is) tu carî naguhere.

- Em ê xwe ji babet û mijarên siyasî vedin û berê xwe bidin hin taybetmendiyên te. Navê te “Rêber” e, lê civat û derdora te hemî ereb in, îcar bilêvkirina navê “Rêber” ji bo ereban hinekî zehmet e. Di bilêvkirina navê te de, çi çîrok û serpêhatî di bala te de hene?

Hin dibêjin “Rûbêr”, hin dibêjin “Rîbêr”, hin dibêjin “Raber” û miletê Libnanê jî dibêje “Reyber”. Jixwe hin kes dibêjin ev ji Sînê ye, hin jî dibêjin ji Iraqê ye.

Bi yek hevokê:

- Herî zêde tu ji çi hez dikî?

Ji dêya xwe hez dikim, ez pir ji dêya xwe hez dikim.

- Gotina ku herî zêde tu jê hez dikî?

Dema dayîka min dibêje: “Xwedê ji te razî be.” Her wiha ez gelekî ji gotina “hêvî” hez dikim.

- Gotina ku herî zêde tu jê aciz î?

Derew.

- Di hunera xwe de, tu li çi poşman bûyî?

Belku di jiyana xwe de ez poşman bûme ku nezewicîme. Dayîka min dixwaze lawekî min bibîne.

- Hevpeyvîna me diqede, ji bo vê suhbeta xweş sipasiya cenabê te dikim.

Ez gelekî sipasiya te dikim. Dixwazim miletê kurd ji hev hez bike. Bila kurd ji zana, rewşenbîr, hozan û hunermendên xwe hez bikin. Ji ber çi ez ê pesinê yê ereb bidim û sixêfên nexweş ji kurdên xwe re bikim!? Bi hezkirinê, em ê welatan ava bikin. Dema em bûn yek, em ê hilfirin asmanan.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Serpêhatî

Kî Tiral e?

Dildarê Mîdî

Hatiye gotin ku yekî kalemêr sê kurên wî hebûn. Piştî ku yê kalemêr çû ber dilovaniya Xwedê, her sê kurên wî li hev civiyan û malê xwe li hevûdin par kirin, da ku ji hev cihê bibin.
Piştî ku malê xwe hemî kirin sê par, gayekî wan ê cot bi tenê ma, jixwe ew jî nayê parvekirin, îcar ew ga ji wan re bû pirsgirêk .
Birayê mezin got :
– Bi rastî gerek e ev ga ji min re be, ji ber ku ez birayê we yê mezin im û li şûna bavê we me .
Birayê navê jî got :
– Weleh divê ga ji min re be, ji ber ku min gelek rêncberî û ked di ber vê malê de kiriye û ga gayê min e .
Birayê biçûk çavên wî zerwilîn û got :
– Çima hûn bi ya Xwedê nakin û ga nadin min? Ma ne remetiyê bavê min dema li jiyanê bû, ji we re gotibû li birayê xwe yê biçûk miqate bin .
Her sê bira li wî gayî asê man û tu kesekî ga bi dest ê din ve berneda, pirsgirêk wekî xwe ma.
Her sêyan da xwe û çûn bal melayê gund, da ku heqiya wan vebire .
Piştî çîroka xwe bi temamî ji melê re gotin, melê ji wan re got :
– Weleh li gor ku ez dibînim, kî ji we her sêyan tiral be û bi kêrî tu karekî neyê, gerek e ga ji wî re be .
Birayê mezin got :
– Welahî ez tiral im û tu kar ji min nayê.
Melê got :
– Çawa tu tiral î û tu kar ji te nayê?
– Ezbenî bi Xwedê eger ez li bin siya dara sêvan jî rûniştî bim û ku sêvek ji xwe re nekeve erdê, ji min nayê ez rabim destê xwe bavêjim sêvekê ji darê bikim.
Melê ji birayê navê jî pirsî ka ya wî çi ye. Birayê navê got:
– Bawer bike ku ez bi rojiya remezanê bim û li çolxirabekê roj li min here ava, beroşek ava cemidî li vî alî min be û beroşek dewê hênik li aliyê din be, ji min nayê ez piyalek av an dew ji beroşê vexwim.
Mele li birayê biçûk nihêrî û jê pirsî:
– Ya te çi ye babo?
Lawik deng nekir .
Car dî melê got:
– Gazina xwe bibejê lawê min!
Dîsa lawik bêdeng ma û bersiva melê neda .Mele qeherî û bi hêrs gotê:
– Çima tu bersiva min nadî kuroo!?
Rabû lawik hêdîka li melê vegerand û got :
– Ezbenî, ji min nayê biaxivim…

Gotarên ku tên weşandin, nerînên xudanên xwe ne.

Dostê Min Kûçik

Li gorî ku tê zanîn, di nava ajalan de cara pêşîn kûçik bûye dostê mirovan, hem jî dostê herî wefadar.
Dema ku mirov ji jiyana nêçîrvanî û berhevkirina pel û pincaran derbasî jiyana nîştecihî û çandiniyê bûye, berî tevahiya ajalan kûçik hewisîne mirovan û hatine kedîkirin(Zanyar wisa dibêjin, ne ez).
Li gorî baweriya min, berî ku mirov derbasî jiyana nîştecihî û çandiniyê bibe jî, ew û kûçik bi hev re dost bûn. Hûn ê bibêjin çawa? Baş e, gava em li dokumentên ajalan dinerin, hinek ajal ne ji nijada hev in lê dîsa jî bi hev re dost in û ji xisletên hev sûdê werdigirin.
Bo nimûne: Fîl û hêştirga zurafa bi hev re diçêrin; fîl ji çavên hêştirgê sûdê werdigire û hêştirg jî ji guhên fîlî sûdê werdigire. Çavên fîlî pir ne xurt in lê gûhên wî pir mezin in, nola radarê dibihîzin. Hêştirg jî xwediya hustuyekî dirêj û çavine jîr e, nola dûrbînê ye. Yek dibe guh, yek jî çav.
Hevkarî û nêzîkatiyên bi vî rengî, di navbera zebra û xezalan de jî pêk tê. Bi hev re li derdora xwe miqate dibin û xwe ji xetereyên pêkan dihefidînin.
Bê guman di nava tu ajalan de girêdan û rastiyeke bi qasî ya kûçik ji mirovan re tune ye. Di nava dem û dewranan de mirov û kûçik qenc hewisîne hev û girêdaneke niwaze di navbera wan de çêbûye. Ev wefadariya kûçik, ji têgihiştina me û wirdetir e.
Kûçik, ajalekî hestzirav û diltenik e. Hema nola mirovan şerm dike, hêrs dibe, şa dibe û heta di hin rewşên awarte de digirî jî. Di heman demê de, ajalekî zûfêhm û bîrbir e jî, bo nimûne: di her rewşê de, bi hal û hewalê xwediyê xwe dizane; xwediyê wî/ê xemgîn be, şa be, yan bi hêrs be, tê derdixîne.
Wexta xwediyê kûçik melûl be, edetî li ber dilê xwediyê xwe dihere û tê. Ger bizane ku xwediyê wî/ê pê re naxeyide, vê der û wê dera xwediyê xwe dialêse. Bi vê tevgera xwe, dixwaze ji xwediyê xwe re bibêje: “Ez hevparê kula dilê te me. Ka kula ku ez pê nizanim ew çi ye? Hinekî bide min, da ku kula te sivik bikim.”
Wexta xwediyê kûçik şa be, ew jî bi xwediyê xwe re dilîze û li dora xwediyê xwe li ser nenûkan direqise. Bi vî hawî dixwaze ji xwediyê xwe re bibêje: “Ez hevparê bextewariya te me. Da ku şahiya di dilê te de lê zêde bikim.”
Wexta xwediyê kûçik bi hêrs be jî, qet bi ser bayê xwediyê xwe nakeve û nakeve li ser xulqê wî/ê. Wekî ku ji xwediyê xwe re bibêje: “Eger ez bi semt û sitara te bikevim, dibe ku hîn bêtir tu hêrs bibî. Loma jî ya qenc ew e ez te bi tenê bihêlim, da ku tu li xwe vegerî û sedemê hêrsa xwe ji holê rakî.”
Kûçik ne tenê kûçik e, kûçik hinekî xwediyê xwe ye jî. Ji lew re kûçik gelek xisletên xwe ji xwediyê xwe werdigire.
Heger xwediyê kûçik bi gir û buxd be, kûçik jî weha ye. Gava girê xwe ji kesekî bigire, tu car ji bîr nake û her girê xwe dikudîne.
Heger xwediyê kûçik di xwe de, genfis û gumre be, kûçik jî xwedî heman xislet e. Gava çav li merivekî dikeve, xwe dideyne û bi dizîka xarî meriv dike.
Heger xwediyê kûçik behcokî û pitpitokî be, kûçik jî kazkazokî û lewlewokî ye.
Heger xwediyê kûçik giran û serwext be, kûçik jî di hed û hudûdê xwe de ye. Wexta çav li kesekî xerîb dikeve, nêta wî/ê ya qenc û xerab hilditeqile û paşê li hember dikeve tevgerê(ev çavdêriya min e).
Xisleta xwediyê kûçik çi dibe bila bibe, ti carî kûçik dev ji xwediyê xwe bernade û her li ber devê deriyê xwediyê xwe ye.
Xwediyê kûçik, kûçikê xwe birçî bihêle, bi tenê bihêle, heta hem birçî bihêle û hem jî lê bide, dîsa jî dev ji xwediyê xwe bernade.
Tim û dayîm ew li mal û milkê xwediyê xwe miqate ye û jê re çavdêr e.
Kûçik ne tenê xwediyê xwe nas dike, her wiha xizm, derdor û cîranên xwediyê xwe jî nas dike. Heta ker, çêlek, hesp, bizin, mîhî, elok û mirîşkên xwediyê xwe jî nas dike û wan dihefidîne. Kûçik ne tenê ajalên malê, her wiha alav û amûrên xwediyê xwe jî dinase û lê xwedî derdikeve.
Ev sedaqet û girêdana di navbera kûçik û mirov de, di navbera tu ruhberan de nehatiye dîtin û ew ê neyê dîtin jî.

KÛÇIKÊ MIN GUHDAR

Ev reşbelekên ku min li jorê der heqê sedaqeta kûçikan de nivîsîne, ez dixwazim bi mînakekê rave bikim:
Dema ez biçûk bûm, kûçikekî me hebû, navê wî Guhdar bû. Guhdar, kûçikekî zincîrreş bû. Ajalekî gelekî bîrbir bû.
Rojekê şivanê me (birayê min ê mezin) ne li malê bû. Bavê min ji dêlva wî ve, ez rêkirim ber pez. Min kerî ber bi rojavayê gund ve ajot. Kûçikê min Guhdar jî bi tengala min ket.
Min hem pez diçêrand hem jî ji xwe re xarr/şaqûlê kevirî çêdikir. Hew min dît li min bûye êvar. Êvarê şivan tev çûn bêriyê û ez tenê mam li wê çola hanê (di payizî de, ber bi êvarê ve pez didotin (.
Sawê ez girtim, ji ber ku ew der cihekî xewle bû û min li xwe kiribû êvar. Divabû min kerî tavil bibira bêriyê, teslîmî şivanê esil bikira. Paşê şivan jî pez ber bi rojhilata gund ve diajot û dibir kurên boz.
Min dikir û nedikir, min nikarîbû serê pez ji çêrê rakira û pez bimeşanda. Paşê min bi derbendê ciher (tûrê nan) girt û vî alî wî alî min avêt ji pez re. Gava ciher nola qertelekî baskşikestî li hewa ket, hingê pez ji ciher tirsiya, bû guregure pêz û di ser hev de terqiya.

Agît Yazar (Egît Jahrîyûs)

Hasilî min dîsa ciher avêt li hewa. Ciherê min çû li nava şikêra kevirان ket. Ez çûm lê geriyam û negeriyam min ciherê xwe nedît. Sofa min jê derket. Bê ciher ez jî ketim rê û min berê xwe da mal. Dêya min ji min pirsî, got ka ciherê te? Min got yadê hal û ehwalê ciher ev e. Yadê got: “Ez virde-wirde nizanim, vegere here ciher bîne. Ez ne ji pişta Mele Yûsuf bim, heger te ciher neanî, tu jî îşev nehatî vê malê..!”
Min kur hilçinî. Di nigê nig de ez vegeriyam. Lê roj çûye ava û bûye sawgura êvarê. Hezar saw û weswese ji min re çêdibûn. Ez çûm li nava wê şikêra ku min ciherê xwe lê wenda kiribû.
Di pişt kevirekî de tiştek dilivi-ya, dilê min got qup! Min got aha bi îman ew tişta li pişt kevir, cin e. Min xwe danî. Tibabekî min xwîn di xwe de sar kir û paşê min dîsa zax da xwe. Min hêdîka serê xwe rakir û li wî tiştê pişt kevir nerî; min dît ew dûvê ajalekî ye. Min hêdî hêdî qad jê dizî û ez ber bi wî ve çûm. Gava ez gihaştim li ba kevir, min dît ew ajal, kûçikê min Guhdar e. Ji şahiyan re min dikir bifirim.
Belê, kûçikê min Guhdar li ber ceherê min veketibû û li malê xwediyê xwe xwedî derketibû...

RÊZIMAN

Venerîneke Dîrokî Li Rewşa Zimanê Kurdî 2

Di encamê de hemû beşdar gihiştin wê biryarê ku tu girêdan û têkilî di navbera Somerî û Ereban de nîne.
Di vê pêvajoyê de jî sala 1999’ê du pirtûk der barê Kurd û Somerîyan de hatin weşandin.
Pirtûka yekê bi navê “Eger Somerî ne Kurd bin gelo wê çi bin “. (Duhok -1999). Nivîserê pirtûkê Mes’ûd Se’îd Yasîn e. Pirtûka duwê jî bi navê “Domozî Melekê Tawûs” e. (Beyrût -1999). Nivîserê vê pirtûkê jî Murşid Elyûsif e.
Van her du nivîseran jî li gora bawerîyên xwe, di pirtûkên xwe de tekez kirine ku pêwendîyeke regezî di navbera Kurd û Somerîyan de heye. Ew bêje û derbirrînên hevbeş jî wê pêwendiyê tekez dikin, wekî ku di vê latika jêrîn de berçav dibe:

Somerî	Kurdî
- A	av, aw
- Agar	avgîr
- Eşar	veşare (veşartin)
- Ben	kole
- Bara	baran
- Tî	tîr, tîrêj
- Tarî	tarî, reşî
- Dub-ba	depp
- Dar	dar
- Bar	par (beş)
- Da	dest
- Go , god	ga
- Ga	kal (pîr)
- Gûr	kûr, gor
- Şû	şû (mêr, hevjîn)
- Namîr	nemêr (xesandî)
- Mê	mê
- Mûş	mêş
- Kaka	kaka, keka
- …	

Gelek gotinên lêkdayî, hevok û derbirrîn jî di navbera her du zimanan (Somerî û Kurdî) de hevbeş hene.
Hin guhertinên denganî di hin bêjeyên wan derbirrînên hevbeş de xuya dibin, lê bi hêsanî ew hevbeşî berçav dibe, wek:
1- Somerî: “NÛ MÊ ŞÛ “.
Nû : ne, no, na
Mê : jin
Şû : mêr
- Kurdî: (Jin bê mêr e)
2- Somerî: “ARA XÛR XÛR TÊ NÛ”
Ara: ard, arvan
Xûr: hûr
Tê nû: tê nûkirin (tê kirin)
- Kurdî : (Ard hûr hûr dike\ dibe)
3- Somerî : (LO GAL BENDDA)
Lo: mêr (baneşana navên nêr e)
Gal: kal, mezin, pîr
Bend-da: pendiyar, zana
- Kurdî: (kalemêrê pendeyar)
Di pirtûka “Somer û Ekkad” de[1] ev evsaneya somerî hatiye nivîsîn: Rêvî ji jina xwe re got: Hilo, ez ê bajarê “Orokê” di nav diranên xwe de, wek qîvarekî bihêrim, ez ê “kulabê”[2] weku pêlavekê bi lingê xwe ve girêdim û wê li pey xwe bikişînim! Dema ku nêzî bajêr dibin kûçik (seh) pêjna wan dikin û direyin. Rêvî radiweste û berê xwe dide jina xwe û bi tirs dibêje: “Çimit mal, Çimit mal”, hêj em li derve ne êrîşî me dikin…

Deham Ebdulfetah

- Kurdî: (Biçim mal, biçim mal)
Bi dîtina min, lihevhatina çend gotin û hevokan têra me nake ku em bibêjin, Somerî Kurd in, yan jî Kurd ji paşmayên Someriyan in .
Ev rast e, lê pirsa li pey vê rastiyê jî ev e:
Eger girêdaneke regezî, di navbera Kurd û Someriyan de tunebe, gelo ev gotinên hevbeş ji kû hatine?!

1- W. Beşşûr : Somer û Ekkad- Şam (1998). R. (154-155)
“ 154-155ص (1998(ودیع بشور : سومر وأكاد –دمشق”
2- Kulab : Tarek ji tarên “Orokê” ye

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî... Ibrahîm Qasim

Nivîskar Ibrahîm Qasim, pirtûkxaneya bavê wî ya ku bi berhemên klasîk dagirtî bû, bala wî kişand û bi saya ewê pirtûkxaneyê fêrî xwendin û nivîsîna bi zimanê kurdî bû.
Di sala 1978'an de dest avêt pênûsê û hestên xwe di malikên helbestê de bi cih kirin. Hevdemî nivîsînê, tevlî kombûn û rêxistinên rewşenbîrî jî bû û gelek çalakiyên wêjeyî li dar xistin.
Hetanî aniha 5 pirtûkên wî hatine çapkirin: der barê helbesta kurdî de du lêkolîn û sê berhevokên helbestan. Di sala 1961'ê de li gundê Hemze Begê yê Devera Koçeran ji dayîk bûye û aniha li Dêrika Hemkoyê dijî. Ew aniha Endamê Desteya Rêvebir a Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyeyê ye.

Serî Derxe

Dîsa werim ba te ez
Dê bijîm jîna te ez
Li ser sînga wekî rok
Dîsa dê binalim ez
Eger tu yara min bê
Hebûn û navêt min bê
Dilbera dilê min bê
Xencer di canê min bê
Ser kete nava porê
Noq girtiye bi zorê
Dil herfî û helya
Di vê jîna wek gorê
Binê gera pir tarî
Bê ziman û zeharî
Serî hilde binêre
Wer mêze ke vî halî
Serîhildan çawa ye
Çi hatiye çi maye
Di şikefta pir tarî
Wek şikefta cina ye
Serî gêj e ranabê
Ku cîhan tev xirabê
Her du çokên min şikandin
Halê me wê çawa bê
Ey keça porî pir bir
Têlên dilê min qot kir
Te dame ber sîngên xwe
Te ev canê min sot kir
Eger xebat wiha bê
D' binê şikeft û gera bê
Tirs ji kî ye birader
Ev dijmin qet ranabê
Tirsonekê bêzirav
Ev şaxê te çi belav
Serî derxe j' bin porê
Ber çavên te bû gerav
Serî d' bin porê maye
Pişt li te pir tewaye
Li pêşî çavên dijmin
Karê te tev xuya ye
Serî hilde û bitirse
Ji xwe re tu bipirse
Ji dijimin xwe biparês
Dijiminê te ne qels e
Hene di nav we de pir caş
Hember we xwe dikin baş
Xwefirotiyê dijimin
Xebatê ew didin paş
Xweşik ew tên naskirin
Dema tê barê mezin
Ser pişta wan giran e
Lewra bi lez direvin

Yên Wek Te Nînin

Mafî ji neyar nexwaze carek
Têkil neke xo di rêk û warek
Serbest biçe pêş xulam neçar in
Aza tu hebî ne kurd hejar in
Sar nabe tu yan çi êl û malek
Pîroz e xebat bi şap û şalek
Biryar nebê tu bidî çi dijmin
Piştê nede wî bimîne hişmin
Serbest biçe pêş derîne derdî
Ev tirk û ereb diçin bi gerdî
Lewma di ezab neçar dimînin
Rêzî û silav ji te r' dişînin
Bêbext e neyar tu baş bizane
Dorpêç dike pez ne wek şivan e
His kir binûsim li ser reqî te
Rêber û serok xwezî wekî te
Hingî me heban berî hezar sal
Kurmanc nediman feqîr, hejar-
hal
Kurdan di dinê hebane dewlet
Serbest bijiyan bi mal û serwet
Perwîze dilî ji ber tu merd î
Bawer bi te em hilîna kurdî
Helbet di dilî tu roh û can î
Min wênekê te di dil de danî.

Kî Arê Min Vemirand

Karê ne berçav em tên firoştin
Şaqis dimînin em têne kuştin
Karê ne ser rê kî bo me anî
Bejna xwe wî bir ev rêç e danî
Arê min ê gur kî wî mirandî
Ev şer û pevçûn kî hilgurandî
Xwîna gelê min va tête noştin
Cerg û dilê min tev têne sotin
Kûştin û wêran her dem bi ser de
Sîfir û Lozan tê hîn ji vir de
Êşa dilê min hew qa bi dax e
Wek vî gelê min hew qa b' semax e
Ev çend hezar sal ew mabû bindest
Wek şêr şiyar bû car dî dirawest
Çi bikim mixabin min got bi rastî
Kurd em ne ser hev kanî biratî.

Şîn û Zayîn

Şîn û zayîn bi hev re
Di beyanî de
Di ronahiya mirî de
Mij û moran e
Nahêlin mirov wê bibînê
Derd dikêşandin
Dil diarandin
Dişewitandin
Dil bi kul
Xwe neparist
Di nîva şeva tarî de
Bê hoş û mest bûm
Min xwe neparist
Ez serxweş bûm
Va ez digrîm
Va ez dikenim
Ji bo çi
Nizanim
Ev çend sal bûrîn
Li ser salên ne xweş de
Birîn kûr e
Hatiye sotandin
Ah oxên tê de kevn in
Kevnar in
Her tişt hebû diyar bû
Piştî dem bûrî
Winda bû
Dixazim ji bîr bikim
Lê bê çare me
Jînek nû
Û yarên nû
Ne wek yên berê
Pir ji wanan dihat xwestin
Lê tu nekirin
Yarên nû
Ew jî ji wan tê xwestin
Tiştên nû
Di nav kul û derdan de
Di nav şahî û…
Hin ji wan nû ne û hin ji wan kevn in
Min bi dest yek nû kir
Ew jî vale bû
Tiştek tê de nebû
Tenê rengek dî
Pirsek dî
Landikek dî
Va ez xwe pê şad dikim
Û dihejînim
Dilî min dîsa şika
Kew serek min e
Îro berdevkê min e
Bêbext e dijî min e
Bi min dilîzê
Li ser pişta min îro siwar e
Girê dama ez
Bi toq û hefsaran
Bê tirs û fedî
Li ser stûyê min
Gelek bi hêz e
Şûnde hiştim
Bi hezarê salan
Xwediyê masê ew jî kew e
Razayî ye ne şiyar e
Dilpola ye serî bivir e
Cihê min bihar e
Lê wek xemare ye
Çi bela van serxweşa ye
Gundî kirin tarîvar e
Zikzikî paşpaşkî
Jînê dixwazin
Na bawer ke kursî dixwazin
Girtin şer
Ketin bedena hev
Ji hev kuştin
Xwîn li hev mištin
Bi serê mezinê min
Yanî kewê te
Li min hilgirtin bar
Şax berdan gund û şar
Çav berdan kursî û pera
Lewra ala min rûxa

Hatin

Li vê dê bandev û ewr e
Dadigirê cîhan
Dengê birûskê
Ev ba gund û bajaran
Ji rahan hildikê



Li ber rojava
Li ber banga mela
Gelek giryabû
Şîn û zayîn bi hev re
Di beyanî de
Şîn û dîlan
Mirin û jiyan
Hev girtin
Gihiştin hev
Û hatin li ba hev
Li ser canê mirî de li ser pêçeka
Mendalekî de
Min xwe nedît
Ji kî re
Ez nizanim

Dilê Min Dîsa Şika

Çaxê axa
Dengê bega
Qeb qeba kewa
Dîsa şîn da
Dilkeviro
Serhişko
Vegera çaxa bega
Dîsa rengê Beko
Da min bikê kolê xwe
Û gul û kulîlkan
Ji wê da ha hatin
Bi xwe re anîn baran û ba
Nema çûn ji vê derê
Kuştin bi hezaran
Der heqa vê qadê
Lê qada min negirî
Û nekir hawar
Da sitemkaran
Sed hezar poşmanî
Ma di rûyê wan de
Weke Rostemê Zal
Weke Dêwê Guhderz

Weke Kawa weke Berzan
Sitemkar hatin ji wê da ha
Çandin di xaka me de
Top û bombe
Şewitandin gund
Û şehar
Nesekinîn ev mêtinger
Kuştin zarok û kal
Nesekinandin ev şer
Şewitandin baxçe û dar
Di zikê gelê min de
Vekirin pencere û derî
Xwîn di erdê re meşî
Bû roja pakrewanan û şehîdan
Min ji bo dayika xwe
Ango welatê xwe
Kirye gorî

ZARÎN

Ey zarîna har
Tu çi neyar î
Ji ser kendalan
Ji ser zinaran
Li çol û beyaran
Li ser gund û bajaran
Di welatê min
Çima dibarî
Ey qeyranê ji ser min rabe
Dema min werê
Te wê jîn nebê
Dema min werê
Dawiya keserê
Wê nalîn nebê
Ey qerana har
Gelek bi tirs î
Lewra dilê min
Ji min dipirsî
Dengê te heye
Keftar û hirç e
Gelek dijwar e
Bilind û zirt e
Dengê te heye
Humîn û xurt e
Dengê te heye
Bi top û tivingê
Zîrek û xurt î
Di şer û cengê
Dengê me heye
Ger em bi yek bin
Ev hêza me ye
Ger bi serek bin
Dengê me gîha
Qefqas û Çînê
Agir ronî da
Li ser zemînê
Ey zarîna har
Derkev ji welat
Ji şar û gundan
Tû wek xezebê
Te qehra min gihand
Dil û kezebê

Gulek Şînhat

Xwêdanek hûr li ser enya wî de hat
Û derket
Bû dilopek giran
Û ma
Higî bû mezin bû
Ji jor hate xwar
Ket ser kevirek mezin
Û ma
Berî sibehê berî banga melê
Gulek şîn hat
Bi çar pelan
Wê bên da
Ji berî roava ji berî banga melê
Dîsa wê canê xwe ji dest da
Zuha bû li ber sirê
Çilmisîn pelên wê
Ji wê dê rabûm min bar kir
Di nîva şevê de vegeriyam

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kultûrname

DILQÊ MEDRESEYA KURDÎ DI VÊJEYA KURDÎ DE - 5

Zeynulabidîn Zinar

Îcar Medreseya Kurdî ji Sedsala Yazdehan ta nîvê Sedsala Bîstan, rola ku di parastina ziman û çanda kurdî de kiriye, em ê pir bi kurtî li jêrê binivîsin:

Ev Çanda Kurdî ya hew qas dewlemend, bi çi hawayî û bi çi tewrê wisa, di binê hewqas zext, cewr, zordestî û qedexetîyê de maye û bi pişaftinê re jî rûbirû heta îro jiyaye, bê ku kêmasiyeke mezin di xwe de bihêwirîne hatiye domandin? Kes heta niha jî li piştpaliya wê nesêwiriye!

Ev pirsa li jorê, babetê lêkolîneke berfireh e ku bête kirin. Îcar min di van 25 salên bihurî de, bi belge û nimûne derxist holê ku di mêjû de çar sazî ji bo parastina Zimanê Kurdî, dilqekî sereke dane leyiztandin û ji Sedsala Yazdeh-Duwazdehan ve karê parastin û bipêşvexistina Zimanê Kurdî heta nîvê Sedsala Bîstan kirine.

Bêguman jixwe diyar e ku di nava Kurdan de ew çar saziyên kurdewarî ku bi awayekî pir xurt Zimanê Kurdî û Toreya Kurdî parastine, ev in:

1- Medreseya Kurdî.
2- Dibistana Zindî (dengbêj û çîrokbêj).
3- Rêçika Şêxantiyê.
4- Sazûmana Axatiyê.

Hin ji van li gor hinekan eger paşverû û kevneperest bin jî, lê rastiya naverokê ev e ku bi taybetî Medreseya Kurdî di radeya yekemîn de roleke mezin ji bo parastina Zimanê Kurdî û parastina Toreya Kurdî daye nîşandan û her tim ew zindî hiştine.

Bê guman çewa ku ziman ji her neteweyekî re serweteke mezin e, jê re şanaziyeke pîroz û giranbiha ye ku ne jê re nirx tê hesabkirin, ne jê re kêşan heye û ne jî pîvaneke berbiçav çêdibe û mirov ji mirina neteweyî rizgar dike, ev hawe ji bo Kurdan jî her wisan bûye û dê wisan jî bibe. Îcar yên xelkê, dewletên wan ew ji mirinê rizgar kirine û zimanê wan parastine. Lê yê Kurdan jî, Medreseya Kurdî zimanê wan parastiye û wan ji mirinê rizgar kiriye.

Medreseya Kurdî her weha devera bicihanîna tore û rêveçûna kurdayetiyê jî bûye. Di wan de wergirtin û edetên kurdewariyê dihatin bikaranîn û şexsiyeta nijadî her tim hatiye parastin.

Bê guman, çewa her welatekî an her neteweyekî li gor tore, edet û rewşa xwe ya civakî di demên bihurî de xwendiye û ku niha jî her wisa dixwîne, bi zimanê xwe dinivîse û dipeyive, berê di nava Kurdan de jî perwerde bi zimanê kurdî û li gor rewşa civaka Kurd hatiye kirin.

KARÎKATÊR

Gotinên Pêşiyan

- Ji kevirê aş girantir tune lê bi mîxekê radibe.
- Rû bi rû guneh efû.
- Aş çûye dû çeqçeqokê ketiye.
- Bihar hat zivistan hilat.
- Bila dijminê mirov şêr be ne rovî be.
- Her warek biharek e.
- Keda helal heram nabe.
- Çax ji çaxê fedî nake.
- Bi bêhna fireh her kes digihe heqê xwe.
- Kar şêr e eger tu bikî dibe rovî.

Kurdî Xweş e

Muzxane	متحف	Derasayî	غير قانوني
Paşverûtî	الرجعية	Dîtbar	مرئي
Peyker	تمثال	Xaçerê	تقاطع طريق
Nimînende	وكيل\ممثل	Xerîk	مشغول
Reşnivîs	مسودة	Paşrewî	الخلافة

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1						■			
2					■				
3				■					
4			■				■		
5		■						■	
6			■		■				■
7						■			
8									■
8	■				■				

Sitûnî

1-Berevanî.
2- Lawir, heywan – Welatê farisan.
3- Evîndara Cak – Şidandî.
4- Du tîpên wekhev – Kesê ku şer dike.
5- Bask, pirtik – Du tîpên wekhev.
6- Tiştên ku ji zîv hatine çêkirin – Dijwateya sitand.
7- Endamekî sereke di malbatê de – Nas û meriv.
8- Danekî rojê – Qirêj, gemar.
9- Bi xew ve çûn.

ASOYÎ

1- Rêxistina siyasî – Amûra kolanê.
2- Ajotin di dema borî de (yekjimar) – Mêrê ku daweta wî li dar e, nû dizewice.
3- Sir, tiştên ku nayên gotin – Cureyekî şînkahiyê, tûj e.
4- Beyreq – Dema ku dunya tarî dibe, piştî êvarê – Reh, damar.
5- Gerstêrkek, kewkebek.
6- Mirovê ku pêwîstiya wî bi vexwarina avê heye – Ling.
7- Rivan belavkirî – Rengekî ala kurdî.
8- Danasîn.
9- Nan tewandî – Piştî ku du'ayek tê xwendin, tê gotin û da dawiya fatîhayê de tê gotin.

Sitêrname 14

Narîn Omer

Dema ku axaftin li ser hunermendeke wekî Merziya Ferîqî be, pênûs, raman û hest bê çare dimînin ku çawa û bi çi awayî ew ê pesinê wê bidin.

Di sala 1958'an de li bajarê Merîwanê yê Rojhilata Kurdistanê, Merziyayê xaka welat bi zayîna xwe pîroz kiriye. Lê belê malbata wê bi xwe ji bajarê Sineyê ye.

Xwendina seretayî û navîn li bajarê Merîwanê bi dawî dike, piştre diçe bajarê Sineyê û li wir tevlî peymangeha mamostеyan dibe. Piştî çend salan bawernameya bilind werdigire, vedigere Merîwanê û mamostetiyê dike.

Di sala 1978'an de bi hunermend Nasirê Rezazî re şû dike û sê zarok ji wan re çêdibin.

Di sala 1985'an de bi malbatê re koçber dibe û li Swêdê bi cih dibe.

Di nehsaliya xwe de dest bi sitranbêjiyê kir û rêya hunerê şopand.

Jiyana Çandî û Siyasî:

Merziya ji malbateke rewşenbîr û xwenda bû, ji lew re malbatê derfet didayê ku rêyên hunerî, wêjeyî û siyasî bişopîne, da ku bibe sembola jinên jîr û çalakvan ên wê demê.

Zanebûn û rewşenbîriya wê, her wiha destekdayîna malbatê hêlan ku Merziya bibe siyasetmedareke navdar. Di destpêkê de tevlî Partiya Komonîst a Îranî (Tûde) dibe, paşê tevlî Partiya Karmendên Kurdistana Rojhilat dibe. Bi rêya van her du partiyan tevlî refên Pêşmergeyan dibe û wekî jineke jîr û zana tê nasîn.

Ji ber helwestên wê yên li dij rêjîma Îranê, derbasî zindanan dibe û gelek zordarî lê tê kirin, lê belê bi vîn û bawerî li ber xwe dide û serê xwe ji wan re naçemîne. Ew sitem û zordarî jê re bûn hêz û xurtî û hewlesta wê li dij siyasetên Îranê hişktir bû, her wiha baweriya wê hêj bêhtir bi doza gelê wê hat.

Her timî di raperîn û xwepêşandanan de başdar dibû, ne tenê wisa lê belê serkêş û rêzana çalakiyan bû. Wekî rewşenbîr, hunermend û siyasetmedar bi hemî hêza xwe tevlî semîner û kombûnan dibû.

Bi karê xwe yê hunerî re -hunera ku hêla bibe sitêreke geş di asîmanê kurdan de- bi hemî hêz û karînên xwe doza mafên jinê jî dikir, bi dengekî bilind dixwest ku zordarî û sitema li ser jinê were hilanîn û hemî mafên wê werin bidestxistin.

Wê baş dizanîbû ku pêşveçûna civakî û serkeftina welat bi tevlîbûna jinê li kêleka mêr, pêk tê. Merziya tu cudahî di navbera xebata mêr û jinê de nedidît; didît ku xebata her duyan civak û welat ava dikin.

Jiyana hunerî:

Hunermenda hêja Merziya Ferîqî ji zaroktiya xwe ve dest bi sitranbêjiyê kiriye. Gelek hêman hebûn ku pê re bûn alîkar: dengê xweş û resen, bixwebawerbûn, rewşenbîriya di hemî hêlên jiyanê de, kar û xebata di partiyan de, malbata wê ya zanyar û têgihiştî û çend tiştên din...

Tişta herî girîng ew bû dema ku ew û hunermend Nasir Rezazî bûn hevjînên hevûdin, di biwara hunerê de gavine mezin avêtin û pêşveçûnên berbiçav bi dest xistin.

Bi rêya lidarxistina aheng û festîvalên hevbeş, her wiha berhemdana albomên hevbeş, nav û dengê wan li nava tevahiya kurdan belav bû. Evînî û hestên her du hunermendan têkilî hev dibûn, ji lew re awazine pir dilkêş diafirîn ku dil û giyanê civakê xweş û geş dikirin.

Ne tenê ji bo ku dengê xwe bigihîne gelan aheng li dar dixistin, lê mebesta wê ew bû ku karibe sazî û dezgehan ava bike, da ku hêj bêhtir xizmeta gelê xwe bike.

Hunermend Merziya li gelek welatên cîhanê festîval li dar xistine, wekî: Almanya, Belcîka, Swîsra, Finlenda, Danîmark, Australia, Amerîka, Kurdistan û çend welatên din...

Girêdaneke pir xurt di navbera wê û milet de hebû, ji lew re dema ku kurdan nûçeya koçbarkirina wê ya dawîn bihîst, gelekî pê xemgîn bûn. Di 18/9/2005 de li Swêdê koça dawîn kir û hestên xwe bi tîpên evîniyê di baxê cawîdaniya kurdan de nivîsîn.

Keça wê ya hestnazik "Dilniya Rezazî" sitraneke bicoş li ser wê sitra ku hestên hemî guhdaran bi sitrana xwe hejandin.

Merziya Ferîqî... Silava Pêşmergeyan

Peyva Windayî

Da ku tu peyva windayî bibînî, peyvên jêrîn xêz bike:

SÊ - PAŞŞÎV - BÊNDER - SÊGOŞE - EFRÎN - AV - DEVLIKEN - AJELNAS - XWEDA - ERMENÎSTAN - XURDEKIRIN - KURDISTAN - DERGÛŞ - KÎSO - KA - PARSÛ - KANÎ - MEHDIK - QUMRÎ - SOZDAR

Peyva windayî ji 7 tîpan pêk tê, ew jî navê dahênerê rêzimana kurmancî ye.

K	U	R	D	I	S	T	A	N	C	S	Ê
S	O	Z	D	A	R	B	Ê	N	D	E	R
S	Ê	G	O	Ş	E	P	A	R	S	Û	T
A	E	F	R	Î	N	L	X	W	E	D	A
E	R	M	E	N	Î	S	T	A	N	A	V
D	E	V	L	I	K	E	N	K	A	N	Î
A	J	E	L	N	A	S	E	K	Î	S	O
X	U	R	D	E	K	I	R	I	N	K	A
D	E	R	G	Û	Ş	M	E	H	D	I	K
P	A	Ş	Ş	Î	V	Q	U	M	R	Î	D

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	M	O	R	A	L	■	Ş	A	L
2	Ê	M	■	Ş	A	H	Î	■	A
3	R	E	Z	■	T	Ê	V	E	L
4	D	R	A	E	■	L	■	D	E
5	Î	Î	■	M	■	A	R	O	Ş
6	N	■	A	B	E	N	D	■	■
7	■	A	L	A	V	■	A	X	A
8	A	Z	I	R	Î	■	A	Ê	S
9	M	A	F	■	N	Î	V	R	O